

15'ê Tebaxê roja ji dayîkbûna gelê Kurd e

15'ê Tebaxê roja rahiştina çek e li Bakurê Kurdistanê. Ev roj roja şerê çekdarî ye.

Dîroka gelê Kurd bi aliye kî xwe dîroka rahiştina çek û şerê çekdarî ye. Raperîn û serhildana Dêrsimê, raperîn û serhildana dawî bû, ku ji aliye dewleta Tirk ve hatibû binpê kirin. Ji sala 1939 an û vir de ewrên kabûsekî reş û bêhnçikêner raserî gelê me hatibû. Xof û tirs ketibû her aliye welatê me.

Dewlet, jenderme û polisîn hikûmetê di çavêne xelkê de bûbûn îlah

Rûpel 15

Bi kuştinan em zêde dîbin



XEWNEK Min di xewnê de dilî xwe vedikir / lê dinêrî / Min li alikî di kûranî de / Kurdestan didî / rengê siper / têde hêlin çekîrî aliyê dî / Dayika min / Tê de rûnîşîf bû rengê hîvekê . Tariya dil ron dikir / ez berî rabim ji xew / Min dilî xwe / wek berê dîsa diqirt. Da welat û dayika min / her di nêva dil de bin J. Dost

Berxwedan, kemin, êris
Şer dom dike

Rûpel 3

Diplomatî û dostanî
R. Cizre

Rûpel 3

Festîwala Kurdistanê
Yaşar Kaya

Rûpel 4

Festîwala Almanya
hejand
Amed Tigris

Rûpel 12

Cejna yekîti û serbilindi-
ya gelê Kurd
Festîwala navneteweyî

Rûpel 16

Ji bo Kurdistanê
referandum
Kemal Okutan

Rûpel 5

Li Urla ci dibe?

Rûpel 5

Rêzana rastinîsandinê
pêwist e
M. Karpetî

Rûpel 8

Salvegera Peymana Sewrê
Seyîdxan Kurij

Rûpel 10

Kurdên Sovyeta berê bi
xwe hisiyan
Vanîkê Elîxan

Rûpel 11

Dewlet kuştiyêner şer eskere nake

● Dewlet, gelek kuştiyêner xwe vedişêre û eskere nake. Li gor daxuyaniya weqfa mehmetçik di deh salê dawî de, di şerê gerîla de hezar leşker di talîman de ji 3500 leşker mirin. Dewlet ji bo ku tazmînatê nede xwediyê wan, kuştiyêner şer eskere nake.

Di nav van 10 salê dawî de dewlet mecbur e ji alî aboriyê di artêşa Tirk de zêdeyî ve alîkariyeke pirr mezin bi 3500 leşker di talîman de mirin!. Zêdeyî 900 leşker ji di şerê bi gerîla re de mirin! Ev daxuyaniyê fermî ne û ji hêla berpirsiyaren dewletê ve hatine kirin. Weke ku tê zanîn dewlet mecbur e ji alî aboriyê ve alîkariyeke pirr mezin bi malbatên leşker û serbazên ku di şerê bi gerîla re de têne kuştin bike. Bi pêşveçûna şerê gerîla re roj bi roj zaiyatên leşkerên artêşa Tirk ji zêde dîbin. Rûpel 15

Mebûsên HEP'ê gera xwe qedandin

Dema ku parlamento ya TC ket tatîlê, mebûsên HEP ê ji dest bi gerê kirin, da ku li herêma rebeberîya taybetî û hawîrdora wî tiştîn dîbin, li cih bibînin û ji van dîtinê xwe raya giştî agahdar bikin.

Ev gera mebûsan 21'ê Tirmehê destpêkir û 4'ê Tebaxê de temam bû. Ji wan mebûsan Ali Yiğit dîtinê xwe wiha tîne zi-man:

"Li her deverê welêt, zilm, zordarî û tirsek mezin heye..."

Dewlet tiştîn ku eskere nikare bike bi destê hizbî kontra û bi destê hêzên dewletê yên tarî dike. Bi vî awahî dixwaze ku tirs bixe dilî gel û gel ji têkoşîna xwe dûr bixe. Her roj iñsanen me yên welatparêz, rewşenbîr û pêşverû ji alî van kontrayan ve têne kuştin. Ji ber vê yekê gelê me divê di nav xwe de komîteyan ava bike û milîşen xwe yên bi çek amade bike da ku rê li wan xwînxwaran bigere." Rûpel 15

● Kuştin û hovîtiyê kontrayan li Batmanê roj bi roj zêdetir dîbin, ji ber ku heta niha welatparêzên Batmanê wek Nisêbinê, Cizîrê, Hezexê û wek Farqînê helwesten xwe yên rast dernexistin holê. Divê ku xelkê Batmanê bi lez milîşen xwe derxin, da ku rê li wan kontrayan bigrin û van kuştinê welatparêzan bisekinîn.

● Dîtin û ramanen ronakbirê Batmanê ji ev e... Welatparêzên Batmanê heta ku li hember van êrisen kontrayan xwe bidin paş û bitîrsin dê ev hovîf û kuştin ji, ji alî kontra ve dom bike. Ji xwe dewleta mîtinger û hêzên tarî ji vê dixwazin. Dixwazin ku gel bitirse û bi vê tîrsê ji doza xwe dûr bikeve.

Kontra êrisen xwe yên li hember rojnamevanan didomîne. Hefteya buhûf du rojnamevan û birayê rojnamevanek ji alî kontrayan ve hate kuştin, rojnamevanek ji hat birîndar kînîn.

29'ê Tîrmehê nûnerê kovara mehanê Özgür Halk Çetin Abayay li Batmanê, 1'ê Tebaxê nûçegîhanê rojnameya

Özgür Gündemê Yahya Orhan li Batmanê li navçeya Kerçewse û 2'ê Tebaxê birayê nûçegîhanê rojnameya Özgür Gündemê Celal Pekgül li Batmanê, ji alî hizbî kontra û hêzên dewletê yên tarî ve hatin kuştin. Nûçegîhanê Özgür Gündemê Burhan Karadeniz li Amedê hate birîndar kirin.

Rûpel 15

Ambargoya PKK'ê tesîra xwe baş nîşan da

Li himber helwest û têkiliyê serokên PDK û YNK bi dewletên imberyalîst û Tîrkiye, PKK berî demekê hemû pêwendiyênen xwe bi van partîyen Kurdistanâ Başûr re birîf û ambargo danî ser Kurdistanâ Başûr, Bi bîryardanî

Rûpel 15

Zîndan û edalet bi hev re nameşin

Rewşa zîndan û girtîgehan, di dewletekê de pîvaneke demokratbûn an ji faşistbûna wê ye. Dewletek di daxuyaniyê xwe de çiqas behsa demokrasiyê dike bila bike, ger di girtîgehan wê de bi hezaran mirov hebin û ev girtî ji ber dîtin

û ramanen xwe hatibin cezakîrin, hingê tu maneya daxuyaniyênen li ser demokrasiyê namîne. Ji ber ku li cihê ku mirov ji bo dîtin û ramanen xwe têne cezakîrin demokrasiyê suna xwe dide diktatorî û fîszmî.

Rûpel 15

ROJEVA WELÊT

Şerê psîkolojîk dewam dike

Dijwarbûna rewşa dewleta Tirk û bêcarietiya wê di her warî de xwe nîşan dide. Lî revêbirê dewletê bi tu awayê çavê wan bar nade vê rastiyê bibînin, an ji hîna hêviya wan heye ku bi dare zorê wê dikarîbin rastiyê biveşerin. Bi rastî, bi vî awayî ji dikevin rewşeye gelek komîk, serê xwe xistine nav qûmê, gewda wan giş li derve ye, lê ji wan kirî kes wan nabîne.

Rûpel 15

REWS

Abdullah Keskin



Berî 15'ê Tebaxê

Civakên hemdem pîrdeng in. Bûyerên civakî ji pîrâfî ne. Lî li welatekî mêtîngeh, civakeke bindest, pîrdengî li alîkî, bêdeng e. Bi bindestkirina civakê, deng û rehê wê ji qut dibin.

Rewşa welatê me pîr xedar e. Birîna civaka Kurd geleki dîjwar e. Li dîrokê bînerin; di welatekî bindest de mêtîngeran tu caran çand û zimanê gel ê wî welati qedexe nekirine. Li Hindistanê Ingîzian û li Cezayîrê ji Fransiyen tu caran çand û zimanê hîndî û erebî qedexe nekirine. Gelek tesîr li dîrok û jîyana wan ya civakî kirine, lê şax û rehê civakê nebrîne, qut nekirine. Niyazi Berker û Cengiz Çandar li ser çûyîna xwe ya Cezayîr wiha dinivisin: "Berî balafîr (teyare) dakeve xwar, li hewayê Cezayîr wek bajarekî Franse xuya dikir."

Mêtîngerân Fransa, zimanê gelê Cezayîrê erebî qedexe nekirin, xelk elimandin transî.

Bajarê Cezayîrê ji hînekî bi "pêş" xistin, dişibandin bajarê xwe. Ev metodên mêtîngerî ên klasik in. Statuya Kurdistanê ji mêtîngehiya klasik paştîr e. Ev 70 sal e Kurd li welatê xwe nikarin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Zimanê me, bi me dane ji bîr kirin. Mirovî me ne elimandin zimanê xwe ji. İro çend Kurd çiqasî bi tirkî dizanîn?

Dewletênu ku Kurdistan perçê kirine, pêşî çand û zimanê neteweyî qedexe kirin. Gelek berhem û motîvîn çanda Kurdi asîmîle kirin. Meji û jîyana civakê ji hevûdu belav kirin. Di dawîya vê politikayê de kesîfi û mejjîyen mirovîn Kurd êsîr kirin. Berxwedan û serhildanê neteweyî blî xwîn û barûdê fetisandin. Daxwaz û riya mafêneteweyî û demokratik girtin. Sînorê sünî di nav Kurdish de çêkirin û Kurd ji hevûdu qut kirin.

Dewletênu ku Kurdistan perçê kirine, pêşî çand û zimanê neteweyî qedexe kirin. Gelek berhem û motîvîn çanda Kurdi asîmîle kirin. Meji û jîyana civakê ji hevûdu belav kirin.

Di dawîya vê politikayê de kesîfi û mejjîyen

mirovîn Kurd êsîr kirin.

Berxwedan û serhildanê neteweyî bi xwîn û barûdê fetisandin. Daxwaz û riya mafêneteweyî û demokratik girtin. Sînorê sünî di nav Kurdish de çêkirin û Kurd ji hevûdu qut kirin.

Cenderme û leşker, bi gotina gel romî, li her derênu Kurdistanê belav bûn. Qereqol û avahîyê leşkerî li her derî ava kirin. Romekî karibû gêra sitiriya bi xelke tevî bike.

Li Tirkîye, İran, Iraq û Suriye riyan demokratik li ber Kurdish girtî ne. Vekirina van rê û kanalan bi şerî çekdarî ve girêdayî ye. Di welatekî mêtîngeh de, ji bo mafêneteweyî û neteweyî, ji şerî çekdarî pê de tu rê tûne ne. Di welatekî bindest de bingeha şerî çekdarî ji, her dem heye.

Roja 15'ê Tebaxê sala 1984'an şoreşgerê Kurdistan perdeke stur kişandan ser vê jîyan û dîroka bê rûmet. Demeke nû destpêkir. 15 Tebax 1984, ji bo Kurdish roja zayînê (mîladê) ye.

Ji 15'ê Tebaxê û vir ve, di dîroka Kurdistanê de rûpelekî nû hat vekirin. Jîyaneke nû destpêkir. Min xwest di vê nîvîse de 3-4 perçeyan ji jîyana û rewşa kevn bînim ber çavan. Hefteya pêsiya me ezê li ser pişti 15'ê Tebaxê bisokinim.

NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN

Rojnamegeriya kurdî û Welat

Bi şahî û dilekî xwes, em rojnameya Welat himbêz dikin û karê we pîroz dikin. Ü em bi dîtineke bilind li vê xebata we yê hêja dinîrin. Ü hêviya me ew e ku hûn tim serifaz bin...

Mirovî ku gotiye xebata pînusîne ne kêmî xebata çek e, ne şas e. Lî belê pînusî divê bikeve xizmeta ës û derdîn mîlet, ew ës û derdîn bê jîmar û mirov re pesnekî dide, lê belê rastiyekê diyar dike, gava ku bêje Welat bi timamî û her awayî ketiye xizmeta gelê xwe.

Rojnamegerî û rojnamevaniya kurdi durust û rast û modern bi derketina Welat destpêkir, ev nîrx

û buhayê rojnameyên kevin yêñ berî Welat winda nake, belê wan ji bi qîmet dike...

Em amade ne ji her rengên alîkariyî re, bi xwe ve û pînusî xwe ve û bi her awayî, lê belê em nizanîn bi çi rengî û çawa eme vê alîkariyî bikine rastiyek û karek. Lewra em ji we hêvidar in ku hûn riya pêkanîna vî tişti ji me re diyar kin û ji bo ku hûn zanibin, em li vî parçê biçûk pîr zor û zehmetiyê dibînîn ta ku Welat dikeve destê me.

Dawî dîsa em xebata we ya hêja pîroz dikin.

Serfirazî para we be...

Kamiran Haco / Qamişlo

İro ser e li "Herekolê" banî Li Cizîra "bavê têlî" (1) li Şîrnex gelê Kurd mil dane hevdû bi yek rex Şiyarbûne êdî nemaye ew xew Berxwedan û serxwebûn e û hew

1: Bavê têlî: Mîr Bedirxan e Konê Reş / Suriye

Erê Mîro

Erê Mîro! Felek çerx û dewran e Rewşen xanim, iro li te mîvan e Bîgerîne civakteke "Botanî" di gel "Rewşen" û "Celadet" û "Xanî"

Rewşen xanim, wê bide te mîzgînî

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîye : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Döviz tevdîat hesap No: 3113617

Aboneyê hêja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh

60.000

12 meh

120.000

Li derive

30 DM

60 DM

Rexneyê şexsî

Zimanê min têr neke ji, ji roja ku rojnameya Welat derketiye ez dikirrim û dixwînim. Min di vê pêvajoye de dît ku hem zimanê min û hem ji zimanê rojnameyê hin bi hin pêş ve diçe. Ez di wê baweriye de me ku rojnameya Welat ji bo min û yên weke min mîna dibistaneke ye.

Wekî din ji Welat li bakurê Kurdistanê pişti 70 sali weşaneke girseyî ya yekemîn e. Tişte herf girîng ji bo rojnamê ji ev e. Hêviya min ew e ku emrê wê pîr dirêj be. Pêwîst e di hilgirtina vî barî de em xwendevanê welatparêz ji li rex we cihê xwe bigrin.

Lê belê ev demeke hin tişten ku di rojnameyê de hatin nîvîsandin ez aciz kirim. Ev ji, hin gotarênu ku di derheqê pirtûkên frensewîde hatine nîvîsandin e.

Bi pêşketina têkoşîna neteweyî xuya dike ku hem li Ewrûpa hem ji li Tirkîye gelek pirtûken di derheqê

Me xwe nas kir

Silavên ji dil, bi rîhevalî

Geli hevalan, nîvîkar Berthol Brecht di pirtûka xwe ya "Pênc zordariyê nîvîsandina rastiyê" de di rûpelê nehan de wiha dibêje: "Nîvîsandina ku tiştek pêxeradibe û dadiweş, rîçek pîr bas û cesareteke pirr mezin dide kesen mêtînger, kesen bindest."

İro, têkoşîna (mûcadelî) gelê me bûne û dîn ku teriya mezin bi profesor, fermanîdar û hikûmeten TC ve ye. İro Kûrdîn ku doh eşir bi eşir şer dikirin bûne "esîra mezin" bûne netewe. Geli hevalan, heta ku rojnameya Welat derket, min baş ne dîzînbû bi zimanê xwe, bi xwendîn û nîvîsandina xwe. Bi hevalan re bi tîrkî em li ser rewşa welat û rewşa cihâne dipeyîvîn. Kêmasiyen min pirr hene belê ezê wan dagirim.

Ez hêvidar im ku keç û xorten me yêni ciwan vê nameya min bixwînin wê ew ji dest bi hînkîrina (elimandîna) zimanê xwe û xwendîn û nîvîsandina xwe bikin.

Ez ji wek we nozdeh-bîst salî me û ez dixwazîm ê nezan ez bim. Bi her hawî li xwe û li têkoşînê xwendî derkevin, ne dema seknê ye, pênûsa we li we pîroz be.

Welat Alasor / Qiziltepe

Hêvî

Em tev dizanîn ev çend sal bû dojmînê me bi her rîkekî hatiye me û dixwest ku me û neteweyî me ji hev biqetin û bişot wisan biket ku edî xwe nas nekin. Lî belê xeyala wan dojmîna xav û sist e hev berî Berxwedan û zanîna gel. Hêviya min ji gelê min ew e ku bêtir hizrobîren xwe bidne xebitîne û her wisa bêtir pênişîn xwe tûj bikin, da ku bi awayekî baştar xizmete çand, tore û folklor û dîrokê û hwd. bîhete kirin.

Ku em lê nezivrin û xemê lê nextwin gelek tişte me yêni giring wê winda bibin. Lewra ez dibejin pevxiye li ser gelê me her yek bi alyê xwe ve xwe şiyarkit dem dem bizar û xebatê ye ji bo saxkirin û pêşebirina zimanê kurdi.

Bila Edîb û hozanvanen me harîkariya dengbêjan bikin ji bo pîr kîrîna kasêtîn nû. Ne her yek sitranen ewê din dubare bikit (tîkrabîkit). Her wisa em hemû bila bes zimanê biyâniya bêxîn nav devê xwe. Me ji zimanek resen (esli) û şîrîn heye li dû peyvîn durust bîgerin, da ku bi zimanek saf û paqîj biaxîvin. Yekû yet desten we diramîsim ewen ku xizmet û gel dikin û meremem dojmîna dibin xwelyê ve winda dikin.

Rîdar / Kurdistana Başur

FERHENGOK

Alligir: Terefdar

Alligir: Terefdar

Belavok: Danezanne (Bildiri)

Cudaxwaz: Dilxwazê cubabûnî (Aynîlikçi)

Cewşandin: Pelçiqandin, êşandin (Sömürmek)

Dahat: Berhem (Ürün, gelir)

Herikîn: (Akmak, akıçılık)

Hevdeng: Yekdeng (Uyak)

Jehattî: Pêkhatî

Li dar xistin: Çêkirin, pêkanîn

Nasdan: Darnasîn

Nîşman: Welat (Memleket)

Nûşegîha: Muhabîr

Pêşangeh: Raxistin (Sergî)

Pêşniyar: Teklif, alternatif (Öneri)

Raperin: Serhildan, intîfada

Rondîk: Hêsir, hêstirk

Sazkîrin: Damezrandin, avakîrin (Kurmak)

Şewane: Rêz (Mîsra, dize)

Veyjandin: Jiyandin

Vexwendin: Dawet kirin

Yarmettî: Dostanî, piştgîrî

Zanav: Nasname

Hilpişkin: Atılım

Aş: (Değirmen)

Aşvan: (Değirmenci)

Cırûsk: (Kıvılcım)

Têhn: (Isi)

Reh: (Damar)

Berxwedan, kemîn, êrîş Şer dom dike

Gerîla kontrola şer û herêmê di destê xwe de digire.

Dewlet jî her diçe dikeve tengasiyek mezin û însiyatifa xwe winda dike.

Lesker, ji xwe re li cihê revê digerin, xwe di qereqolên xwe de vedişerin, lê ew qereqol li serê wan têñ hilwesandin. Gerîla şerê xwe bi firehî û kîrîhî pêş ve dibe. Li xeta Behdînan û Botan gerîla ber bi artêşbûnê ve bi xurtî dimeşin. Li Xerzan, Amed û Serhedê jî

şerî gerîlatiyê bi pêş ve diçe û rehê xwe berdide nav gel. Gel jî bi serhildanê xwe, ev meşa ber bi rizgarbûnê ve pîroz dike.

2 Tebax 1992 Li gundê Hezex, Tilêla, di nav gerîla û hêzên dewletê de şer derdikeye û 5 gerîla piştî ku berekêwan xelas dibîn dikevin şikevtekê û ji bo nekevin destê dewletê xwe ïmha dike. Li ser vê bûyerê esnafê Hezexê protestoyek li dar xistin. Esnaf dikanêwan bi hîzbî kontra re herdu jî di nav gund de dikujîn.

xwe girtin, xelk jî ji malêñ xwe dermeketin.

-Li Qosar (Qiziltepe) jî esnaf li hember kirinêñ dewletê û qirkirêñ kontrayan dikanêñ xwe girtin.

-Gerîla davêje ser gundekî Tetwanê bi navê xwe "Dibekli" û mele tevî jina wî û gundiyan di camiyê de komdikin. Piştî propagandayê, Mele Abdurahman Sure tevî jina wî mehkeme dike, dû re, ji ber têkiliyê wan bi hîzbî kontra re herdu jî di nav gund de dikujîn.

4 Tebax 1992: Li navçeya Varto, di çiyayê Şerafetin de konvoya leşkeran dikeve kemîna gerîla û 25 leşker tevî serbazek (astsubay) têñ kuştin. Di vî şerî de 4 gerîla jî têñ kuştin. Ji bo van gerîlayêñ ku di şer de dimirin, esnafêñ Vartoyê dikanêñ xwe girtin.

-Li navçeya Kerboran hêzên dewletê avêtin ser maleke Kurd. Di vê male de gerîlayêk keç ku navê wê yê kod "Çiçek" e, ji bo nekeve destê hêzên dewletê xwe kuşt. Li ser vê bûyerê Kerboranî dikanêñ xwe girtin.

-Li gundekî Midyadê gerîla cerdavanek û 3 muxbir kuştin. Cerdevan Sebrî Ataç û muxbir Orhan Ataç, Nurî Mal, Mehmet Güneç bi kirinêñ xwe yêñ li hember gel dihatin nasîn.

5 Tebax 1992: Li Sasonê çiyayê Mereto, leşker tevî panzer û cemseyen xwe ketin kemîna gerîla, 4 leşker hatin kuştin, 10 jî birîndar bûn. Panzer û erebeyen leşkeran jî hatin ïmha kirin.

-Gerîla li Licê bi roketan êrişek birin bi ser qereqola gundê Hezan ve. Ev qereqol bi carekê şewiti. Dewlet zayıfatê xwe yêñ di vê bûyerê de vedişere.


-Gerîla li Hezzo (Qozlux) jî bi roketan êris dibe ser qereqola "Yedi bölük". Di dermafê kuştî û birîndaran de tu nûce negihan destê me.

-Li Cizîrê 2 panzer ku li nav bajêr digeriyan, bûn hedefê mîlsan. Panzeren bi te mamî ïmha bû. Di dermafê kuştî û birîndaran de nûce ne ketin destê me.

-Li Motkî 4 cerdevan di şerî bi gerîla re de hatin kuştin.

6 Tebax 1992: Li Bismîlî esnaf dikanêñ xwe girtin. Ev protesto, ji bo gerîlayek ku li Stewrê hatibû kuştin li dar ket.

-Hîzbî kontra li Nisêbinê, muxtarek welatparêz tevî kurê wî qetil kirin. Piştî bûyerê gel bi dû qatil dikevin, di malekê de diqeşfelin û dikujin. Dîsa li Nisêbinê, xelk di rê de endamekî hîzbî kontra dixwaze biqefèle. Ev şeytanok bi ser xelkê de berek direşine û welatparêz bi navê xwe Hüseyin Baybars tê kuştin.



Kontr-gerîla, hîzbî kontra (hîzbî dewlet) cinayetîn xwe dom dike.

KONEVANIYA NÛ

R. Cizre

Dîplomatî û dostanî

Dostaniya Kurdan tiştekî erzan nîne. Hemû mirovên ku piştigirî û hevalbendiya Kurdan dike, dijminê Kurdan wan didin ber topêñ êfîşbaziyêñ xwe.

Heta vê rojê mirovên dostaniya Kurdan kirine, ji hêla çinêñ (sinifîn) serdest ve bûne armancêwan yêñ pêsemîn. Dîsa bi gotinêñ mîna: "Ew mirovekî dîn bûye", "Mejiyê xwe winda kiriye" û "pere xwarine" û hwd. diçine ser wan.

Nelson Mandela berî ku xelata Atatürk qebûl neke (red bike), dixwestin dostekî xwe nîşan bidin û bi vê yekê jî li ser pirsa mafêñ mirovan spekulasyonê xwe bikin. Lê piştî daxuyaniya Mandela ji bo neqebûkirina xelatê êdi li gora qelemsûren babîlî û berdevkîn (sözcü) dewletê bû "Çirkin Afrikalî", bû "reşikekî dîn û xwe winda kiri", buhayê wî jî li cem wan bû pênc pere.

Ev sefaleta çinêñ serdest yêñ biyanî ye.

Ev ew rastiya dijminê Kurdan e ku nikarin veşîrin.

Li kîleka vê sefaletê yeka din jî heye, ew jî sefaleta çinêñ serdest ên Kurd û serok-merokê multecî ye.

Dostan Kurdan heta vê rojê pirr kêm in. Hinek militan hene, hinek nîvdîlî hene, hinek ditîrsin û hinek jî bi navê dostaniyê dixwazin rastiyê veşîrin û mîna papazan dixwazin misyoneriya Kurdan bikin, Kurdan bînin ser "Riya Rast".

Gelek caran di salonê konferansan de, dîplomatîn Kurdan ên multecî dikevin pozisyonâ dîstekî Kurdan de û kesîn xwe dost jî nîşan didin, dibine weke xwedîyê meselê. Ev tu caran nikare tiştekî rast were qebûl kirin.

Dostanî piştigirî daxwaz û hêviyêñ Kurdan e, ne "çêkirina" strateji û taktika wan e.

Di navbera dostanî papaz û dostan militan de, ji erdê heta ezmanan cudahî heye. Dostanî papaz dibêjin: "Dilê me pirr nazik e, eman bila zarok keviran nehavêjin panzeren dewletê, camê saziyêñ dewletê neşkînîn, dûre wê xwîn-mîn ji tiliyê karmandan (memûran) were." Dostan militan jî wiha dibêjin: "Helbet Kurdan welatê kesekî venegirtiye û di zîndanêñ xwe de kesek infaz nekîrine. Kurdan mafê mirovan neperçiqandiye. Eger mafê çarenûsî ji bo her mîletekî tê qebûl kirin, girîng e ev maf ji bo Kurdan jî rast were dîtin û hemû pirs jî li wir diqedin."

Dostanî papaz ne dost in.

Dost ew mirov in ku, mafdarîya doza Kurdan ji bo gelêñ xwe û mirovatiyê nîşan didin.

Ne tenê du cure dostañî hene, lê wiha jî du cure dîplomatî hene, dîplomatiya parsê û dîplomatiya xwedî pişt.

Serok merokê vê rojê multecî ne, hunerbazên dîplomatiya parsek in. Li her saziyeke navneteweyî, parti û hêzên siyasi mîna Xaça Sor dinêrin. Derdêñ wan jî ev e: Çawa dikarin hinek pere bigrin? Çawa dikarin kovar-movarîn xwe finanse bikin? Çawa dikarin kirîya komele- çayxaneyen xwe peyda bikin? Çawa dikarin bilîta cûn û hatinê ya balafrî peyda bikin?

Navê dîplomatiya parsek ya vekirî bi şeweylekî din dîplomatiya bi paseporten dijmin yên sor e. Jîyana xwedîyê wê jî kin e û mîna berikêñ şeşregê (satranc) ber bi meydanê ve têne vedan.

Dîplomatiya xwedî pişt jî ew e ku mirov lingê xwe bi qasî birra (mehfîra) xwe bavêje û li gora hêz û hîma xwe deng bike.

Bi fort û zirtan û jî kîsê xelkê dîplomatî nabe.

Mirovan dikarin dîplomatiyê bikin ew mirov in ku, di civakêñ xwe de xwedî pişt û hêz in. Her gavê dikarin gel rakin ser piyan û ji bo berjewend (menfaat) ên wî, wî bixin nava berxwedan û serhildanê.

Yêñ ku sibê dixwin û ji bo xwarina nîviro bê çare dimînîn, dikarin her cure xulamtiyê bikin, dikarin çend meh û belkî çend salan xwe têr bikin, lê hema dawiyê wê jî ber xezeba gel û ji birçibûnê bimrin.

Dijmin ci bêje tu jî bêjî: Belê, efendim, zor baş e. Ev dîplomatî navê wê di termînolojiya Kurdan a modern de sixurî ye, cehşîti ye.

Xulamtiya hêzên ku, Şêx Seîd, Seyit Riza, Qazî Muhammet û Leyla Qasim bi darve kirine û yêñ kenê xwe bi Qasimlo kirine nabe dîplomatî.

Hêza ku di Kurdistanê de dikare şivanekî bike general, ji bilûra şivanekî orkestra çêdike û mirovekî bê xwendin û nîvîsandin bi demê re dike muhendisê elektronê, helbete dikare dîplomatî xwe çêke û çêkirine.

Dîplomatî ne rezalet, xwe firotin û bê prensîb tevger kirine.

Dîplomatî di nava meydana navneteweyî de, di riya berjewendiyêñ gel de, bikaranîna hêza gel bi xwe ye.

Xerîbî zor e, mirina hêdî hêdî ye, bi pencên xwe yên gemar giyanê ji canê mirovan dikşîne. Mîna kevirê aşan e, mirovê xerîb ji mîna genimê kewrikî û hişk, di nava zivirbûna kevirêni biyaniyê de têne hêrandin, dibine ar û mirovên ne mirov dest pê dikin û dixwin. Hestiyân dikine komer, di çileyê zivistanê de xwe li ber tîna wan germ dikin û jiyana xwe berde-wam dikin.

Xerîbî zor e ! Mîna hûtê dev ji hev e, xerîb ji mîna masiyêñ hûr û bê çare di nava qîlêñ wan de têne cûtin. Xerîbî mîna daristaneke tarî, xwe lê digirin, ta ku libekî

Xerîbî zor e !...


H. S E F K A N

bi saw û tirs e, tijî hov û hirç in, tu dibîne ku mirov di nava devê hovekî de, vê care bêyi ku te bicû, te dadiqurtîne.

Xerîbî zor e ! Mîna xefka ku di berfê de bê vedan. Dema ku her never ji berfê sipî ye, tenê cihê xefkê reş dike, ji lewre ji, çivîkêñ birçî xwe lê digirin, ta ku libekî

xwarina xwe lê bibînin, lê mixabin têne xapandin, sexte ye, mirov dixwaze gul perçeyê reş li wan dibe û gulçînan bêhn bike, dojeh, dema ku di nava devê mixabin, ew ji bêvilê dixapînen, bê bêhn in tama xweliya xefkê de diferfitin. Wiha ji, mirovê xerîb dema ku xwe li "demokrasî û serbestiya" dîsa, mirov wiha dibêje, genimê xerîbiyê mirov dixapîne û dide girtin.

Xerîbî zor e ! jiyanekê mixabin têne xapandin, sexte ye, mirov dixwaze gul perçeyê reş li wan dibe û gulçînan bêhn bike, dojeh, dema ku di nava devê mixabin, ew ji bêvilê dixapînen, bê bêhn in tama xweliya welatê mirov ji tilmikên axa wan nayê. Ji lewre dîsa mirov lêvîn xwe paqîj dike, mirov naxwaze ku maçike. Mirovên wan, bê derd û xem dijîn, tu carî ofîn û axînan



Yê xerîb; kor e, laj e, kerr e, dîterpîlin, tewş dibîn, nîzanîn roj ji kîjan hêlê dertê û bi kîjan hêlê ve diçê ava.

GOTİN

Yaşar Kaya



Festîwala Kurdistanê

Ez ji mîvanê festîwalê bûm. Pişti sîh salan ji nû ve derdiketim derveyê Tirkîye. Ji bo min her tîst nû bû. Min dê jiyan û rewşa Kurdistan li Ewrûpa bidîta. Festîwala Kurdistanê nav û dengekî pîr mezin li dû xwe hişt. Hevalan Li Bochumê stadeke mezin girtibûn, stad bê qisûr bû.

Mîvanan bi nav û deng giş hatibûn, xeynî Aramê Tikran, ew ji nexwêş bû. Program 10-12 saet bû. Pêşî gazî mîvanan kirin, giş bi hev dan naskirinê. Di stadê de nêzîkî 60 hezar mirov hebûn. Paşî hevalan got ku 72 hezar bilêt hatine

firotin. Kurd û Alman zehf bûn. Ji Filistîniyan bigrin, heta İspanyolan, ji Yewnanan heta Katalonan, her kes bi ked û dilxwazî hunerên xwe pêşkêş kirin. Organîzasyona Komîteya Kurdistan pîr baş bû. Li der û dorê stadê, 30-35 cihê xwarin û vexwarinê hatibû amadekirin. Xorten Komîteya Kurdistanê, bi têlsizên xwe der û dorêن xwe kontrol û idare dikirin.

Gelek Kurd ji derdorê Almanya û ji welatê Ewrûpa hatibûn Bochumê. Der û dorê ji otobosan bûbû mîna cihê mehşerê. Jin û zarok, xort û bûk, bi kîncêñ kesk û sor û zer hatibûn stadê. Stad ji bo wan bûbû cihê dîlaneke pîr mezin. Xort û keçen Kurdan, pêşî jîmnastîkeke pîr xweş çêkirin, di dû wê re, stadê bi wêneyên şêhîdan xemilandin. Koma Şîrvan, Bilgesu Erenus, Beşîr Botanî, bi stranê xwe dilê gelê me geş kirin. Ji çarmedorê dînyayê gelek mesajîn pîroziyê bi rî kiribûn ji bo festîwale, di vê navê de mamosteyê mezin Ismail Beşîkçi ji

mesajek şandibû. Hevalan digot, êvarê televîzyonê ji got, serokwezirê Almanya nikare 8-10 hezar kes bîne cêm hev, ji ber vî ev civat, civateke dîrokî ye. Ji Fransa, Belçîqa, Hollanda, Norweç, Swêd, bi dehhezaran Kurd li Bochumê civiyabûn. Pişti nîvro stad tijî bû, bi hezaran mirov li derveyî stadê man. Ew nikaribûn bîkevinê hundir, lê deng û axaftinê mîvanan û stranen dibîhistin.

Li Bochumê, di otelan de cih nemabû. Serokê Partiya Keda Gel Ferîdun Yazar, Mebûsê Müşê Sirri Sakîk û gelék mîvanan din digotin, me civateke wiha geş û bi şayî nedîtiye. Wekî din ji, ne hêsan e mirov 50-60 hezar mirov bîcivîne.

Kurdên ku ji hawîr dorê Ewrûpa hatibûn, hev û din hembez dikirin, dilê wan, destê wan, çavê wan bûbû yek. Ji welatê xwe dûr bûn. Lî belê dilê wan li welatê wan bû. Min di çavê wan de gelek tişt dît û xwend.

Bi silav û evîna welatparêzen li Ewrûpa!


nakişînin. Lî yê xerîb, kor e, lal e, kerr e, di terpîlin, tewş dibîn, nîzanîn roj ji kîjan hêlê dertê û bi kîjan hêlê ve diçê ava. Ew mîna mirovê ku şev û roj lê bigere gêj û tewş dimîne, li dawiyê yan xwe dikuje yan ji tew-tewe û dîn dibe...

Xerîbî zor e ! Lî hîn jê zortir heye. Li welatê xelkê ji mirovên xerîb re dibêjin "xerîb kotî ne". Tu bi çavêñ xwe dibînî ku çawa çavêñ xwe li mirov sor dîkin, diranêñ xwe bi ser hev de diguvêşin û êrîşan tînin ser mirov. Bi serê solêñ xwe yên tûj û hesin li kîlek û hestiyêñ mirov dixin, di pelixînin, dişkênin. Belê, tu dibîhsî, dibînî, lê tê çibikî..? Wê kî bi hewara te ve bê..? Tu çiqasî dengê xwe bilind bikî, ne Heso, ne Hemo te dibîhîze, ne ji dengê te dîghêje gundê te.. Ax, çiqas zor e. Wê çaxê mirov dibêje, sed xwezî bi mirina li ser axa welat, bila canê mirov qîtik-qîtikî bibe, bila dohnê laşê mirov li wir bihele, giyayê wê pê şînbe û berxik û pezên welatê mirov pê têr bibin, bila seyên welatê me goşte canê mirov bixwin û bireyin, belkî li ser sînoran keriyêñ berxan ji hovan biparêzin.. bila bila û ... Tenê bila ew gotin "xerîb kotî ne" ji mirov re neyêñ gotin.

Sed xwezî bi mirina li ser axa welat, bila canê teze li ber lingê panzêran bê perçiqandin û bi axa welêt ve bibe yek, bila jiyana hebe, hemû li zindanan be, li serê çiyan be, lê bila jiyaneke bi rûmet be, ger mirin ji hebe, bila mirineke bi şeref be.

Xerîbî zor e hevalno, bila pêtîn ji agir di canê mirov de biçikînin, bi pizotan can bikizirînin, bi balefirand Gund û bajaran bombebaran bikin (Girîng e ku gotina mamos-teyê berxwedanê Mazlûm Doğan ji bir nebe, em bêjin "Berxwedan jiyan e") û em sînorê gundê xwe derbas nekin. Eger ne ji wan mûmîn şeva tarî bûna, yên ku xwe kirin gorî û bûn sembla berxwedanê, emê ji, ji mêj de biketana nava devê xefk û defêñ xerîbiyê. Lî bi hebûna wan em ji li vir dibêjin "Berxwedan jiyan e". Ne dijmin û ne ji xerîbî bi me nikarin, ji ber ku emê vegerin û em di nava qîlê wan de nayêñ cûtin, em soz didin ku emê vegerin û nema carekê din ava cem û sînor Gund derbasdikin, bila bi şeref em li kîleka cemê xwe şêhîd bibin û xwîna me tevlî ava wî bibe, lê em nema ji wir diçin...

Xerîbî zor e..



Dadgeha
Ismail Beşikçi

Weke ku tê zanîn mamoste Ismail Beşikçi, ev çend sal in ji ber 13 pirtükên xwe ku li diji ideolojiya dewletê nivisiye, di navbera girtîgeh û dadgehan de diçê û tê. Yek dadgehek van ji 5 û Tebaxê de çebû. Di vê dadgehê de mamoste Beşikçi û xwedîye weşanxana Yurt Ünsal Öztürk bi hev re hatin mahkemekirin. Heyeta dadgehê doza ku li 13 pirtükân dikirin, teva bi hev re kîrin dosyayekê û dadgehê talok kîrin.

YENİ Ülke



Komkirina cara 36 an

Rojnameya heftane 'Yeni Ülke' di 3.8.1992 an de, ji aliyan DGM û ve hat komkirin. Biryara komkirinê, li ser nivîsa nameya Ismail Beşikçi ku ji Yekta Güngör Özden're nivîsibû hate standin.

Rojnameya Yeni Ülke ji destpêka weşandina xwe ve heta û 42 hejmar derketiye. Ji van 42 hejmaran 36 hejmar hatiye komkirin.

Civîna wali û miftiyân

Li Diyarbekirê waliye bajêr, û serokatiya karê oli bi hev re civîneker çekirin. Di vê civîne de ji 15 bajarê Kurdistanê 214 miftî, waiz û rektorê zanîngeha Dicle Sedat Arıtürk kombûn. Di civîne de bi piranî li ser gesbûna têkoşîna PKK û li diji vê gesbûna têkoşînê dikarin ci bikin, sekinin. Serokatiya civîne wekîle "Serokatiya karê oli" Mehmet Nuri Yılmaz dikir.

Dewlet ji li hember têkoşîna gel û nûjîna ku di welat de çedibe, dixwaze listikê bi qirê bilîyize. Bi piranî ji listikê xwe di babetên dînî de çedike. Hizb-i kontra têr nake niha ji propaganda dînî dike.

Alîkarê sekreterê giştî ê HEP ê Kemal Okutan dîtin û ramanen xwe yên li ser geşta gund û bajarê Kurdistanê anî ziman

'Ji bo Kurdistanê referandûm'

Kekê Kemal hûn sedemê geşta xwe karin bînin ziman, hûn çend kes ketine geşte, kengê we dest pê kir

-Geşta me 21'e Tirmehê destpêkir, heyani 4'e Tebaxê domand, di geşte de komika ku min di nav de cih stand 6 mebûs û 3 endamên meclisa HEP û bûn, mebûsên di geşte de bi navê xwe ev bûn, Selim Sadak, Ali Yiğit, Remzi Kartal, Nizamettin Toğuc, Zübeyir Aydar, karbîdesten navenda HEP û, ê giştî ji ev bûn, yek jê ez, Ismail Aslan û Hızın Çınar.

Geşta me geştek derengmayî bû, girîng bû ku me beriya niha ev geş çekiribûna, pêk anî ba, armanca geşta me, bûyerên herêmê em bi çavê xwe bibînîn, li gund û bajarê Kurdistanê em dîtin û ramanen mirovan guhdar bikin, zilm û kotekiya dewletê bi çi awahî li herêmê têye kîrin, em bibine şahid, di derheqê van pirsgirêkan de, raporek amade bikin, ji gelê Tirkîyê û yê cihanê re bînin ziman û pêşkêş bikin. Geşta me ji Ruhayê destpêkir, paşî Mîrdîn, Şîrnx, Hekâri, Wan, Bedlîs, Sîrtê û Batmânê me dawîya geşta xwe anî.

Li herêmê ji xeynî bajaran hûn li gundan ji gerîyan an na?

-Belê, weke gundêne Mîrdînê Qurdîse (Vardere), gundêne ku dewletê qetîfam lê kiribûn û hwd. me geşta xwe dom dikir.

Di geşta we de li ser pirsgirêk û bûyerên herêmê mirovîn ku di derheqê zilm û kotekiya dewletê de saloxdarî ji we re beyan kiribûn, hêzên dewletê ew işkence kirin û xistin binçav, gelo bê tirs mirovîn herêmê kul û

derdên xwe karibûn, bînin ziman?

-Belê ev tişîe ku tu dibêjî rast in, hêzên dewletê gav bi gav li dum me bûn, koteke li gel dikirin, işkence bi wan dikirin ên ku kul û derdên xwe tanîn ziman, armanca wan dixwestin ku em dev ji vê geşte berdin, belê bi evqas tehdîdan ji her cihê ku em cûnê bi hezaran gel li me kom bûn û pirsgirêken herêmê ji me re anîne ziman, li Geverê (Yuksekova) 5 hezar mirov hatin pêşîya me, geleke xwes û rind derbas bû, belê, ku em ji Geverê vejetiyan, hêzên dewletê bajar xera kîrin.

Tar û marî hev kîrin, tevî avahiya HEP û, 49 dikanen gel tev şikandin, li ser vê bûyerê em cardin vejeriyan Geverê, me lêkolînen xwe kîrin, pey de, em rastî qumandanê alayê hatin, gotinê serlesker ev bûn: Em 3 kes ekîbek in ,ez Qeymeqam û Yuzbaşî. Emê vê derê li we bikin cehnem, ji çebûna dayika xwe hûnî poşman bibin, em bi taybetî hatine neqandin, ji bo ku em xwîna we vexwin. Belê wisa xuya dike ku, edî li Kurdistanê ne şerekî bi dizî, şerekî eşkere tê meşandin, ev ser ne li hember PKK û tenê ye, dewleta Tirk li hember hemû gelê Kurd şer dike, edî ev şer şerê dewleta Tirk û gelê Kurd e, hêzên dewletê yê ku li Kurdistanê wezîfê dîkin tev bi destûrê daîra şerê taybetî MGK tayîn dîbin û qetîfam li Kurdistanê dîkin.

Di van rojîn dawî de hizb-i kontra livbaziyyen xwe didomîne, piranî li hember çapemeniya şoşegîr û demokratik, li metro-pôlê ji tîrsî li Kûrdîn rewşenbir

û saziyên demokrat diafirîn, ji bo vê yekê, bi ci rengî wê gel xwe biparêze, weke ci wezîfe li ser milêne û saziyên demokratik dikeve?

-Belê livbaziyyen hizb-i kontra ne li Kurdistanê tenê, li metro-pôlê ji têne afirandin, ev tengasi û hejarbûna dewletê ye. Hizb-i kontra ne li hember gel tenê ne, li hemberî saziyên demokratik ji livbaziyyen xwe didomîne. Weke rojnameya Özgür Gündem, Yeni Ülke, Özgür Halk û Welat ... Lewra, ev saziyên nû ruwê dewletê yê rûres derfîn holê.


Ci gotinêne we yên dawî hene, bi tevayî dîtin û ramanen xwe yên di derheqê geşta xwe ya li herêmê bi kurtasi karin bînin ziman?

-Belê, dewletê çarhawîrê herêmê mayin kîrine, heke gel bi cihê wan mayina nizanibe, wê bi hezaran gel qetil bibe, ev mayin ne bi gel tenê diteqin, leşkerên Tirk ji nesîbê xwe ji wan xeska distin.

Li Kurdistanê ne şerê taybetî û çekê tenê ye meşandin, şerê psikolojîk û bi giranî ji şerê aborî tê ye meşandin, hemû deriyen ticaretê, li ber gel hatiye girtin.

Li Beytülşebabê gundî ji bo erzaq dema têne bajêr, li gora nifûsên malbatê dewlet erzaq dide wan, diben yê zêde hûn dibine ji PKK û re, mirovê ku zarokê wîna kitim bin û li nifûsê nehatibe nivîsandin, erzaq nadin wan, weke ku hûn zanîn gelek malbat li Kurdistanê zarokên wan hê ji kitim in...

Gundiye Yekmal ev ji me re gotin: "Xwestîn me ne elektrîk, re, av û têrkirîna zikê me ye,



Kemal Okutan

xwestîn û daxwazê me jiyanek bi rûmet, xwedî maf û azadî ye, pirsgirêka me ne aborî ye, pirsgirêka me yê ferz siyasi ye.

Li herêma civîna me bi reisên belediyen herêmê ji afirî, me got: "Di vê hûn ji kîjan Partîy bin, li hember van qetîfamên dewletê yek bin, wan ji soz dan ku li hember qetîfamên dewletê deren, yekîti û tifaqîya gel biafirîn.

Girîng e ku li herêmê referandûmek were afirandin, bi demokratik hilbijartinek çêbibe, xwestîn gelê Kurd ci ne, gelo, gel jiyanek weke a iro bi koteke dixwaze, an jiyanek serbixwe û demokratik dixwaze wê were kifş kîrin.

Li ser lêkolînen herêmê emê rapora xwe bidin destê hikûmetê û di hêla diplomasî de ji, emê dest bi xebatê xwe bikin.

Heppevîn: S. Arjen

Lîstika nîjadperestiyê li Urla

Dewlet û rojnameyên Tirk ji bo berê gelên Kurd û Tirk bidin hev, listikê cur be cur dileyizin.

Dewlet li hinek bajarê Tirkîyê rêtixînên olî û nîjadperest avadike û ji bo neyartîya Kurdan bikin, her cure alîkarî dide wan. Rojnameyên Tirk ji, çawa ku bi rastî ji neyartîye di navbera herdu gelan de hebe, agirê ku dewletê pêxistiye, geş dîkin.

Van rojîn dawî dîsa li pey listikeke nû ne. Li Urlayê dixwazin berê xwedîye mînibusan Kurd û Tirk bidin hev. Munaqese û meselen bêşîmet ên ku di navbera mînibusan Urlayê de qewimîn, ji hêla mafya û rojnameyân Tirk ve wek dijmîntiya Tirk û Kurdan hatin pêşkêş kîrin. Bes mînibusan neketin vê listikê û diyarkîn ku mesela wan ne dijmaneyetiya Tirk û Kurdan e.

Li Urlayê şîtalkirina hinek rawestîngehan rewşa mînibusavan ne xweş kîrin. Ji ber ku hejmara rîwînên wan kêm bûn û ji alf aborî ve ketin rewşike dijwar, ji ber vê yekê ji li ser çend rîwînân di navbera hinek mînibusavan de munaqese derket û şer kîrin. Ev kesen ku şer kîrin bi tesaduff, hinek ji wan Kurd, hinek ji Tirk

bûn. Rojnameyên Tirk û mafayê dewletê ev wek firsetek dîtin û di nav mîlet de flankirin ku li her derê Izmirê berê Tirk û Kurdan ketiye hev, neyartîye dijwar ketiye navbera van herdu gelan.

Bi vî awayî û bi belavkirina xeberen derew xwestîn ku li her derê neyartîye têxîn nav gelê Tirk û Kurda. Yanê mesela mînibusavan Urlayê ji listikeke dewletê

û rojnamevanen dewletê bû, lê divê armanca xwe de serfiraz nebûn.

Li ser vê listikê Reisê Belediya Urla Bûlent Baratali dîtinên xwe wiha diyar kîrin: "Bûyer û munaqşeyen wiha li hemû deran çedîbin. Ev geleke normal e. Sebebê vê bûyerê ji, ne dijitiya Tirk û Kurdan e. Ev bûyereke bê qîmet e û divê mezîn nebe. Doh êvarê ez li temamê vê herêmê

geriyam, tiştekî anormal tune bû, herkesi wek her êvar bê xof û bêtirs jîyan xwe didomîn."

Li ser vê listikê nîjadperest, mebûse HEP'ê Naif Güneş ji çû Izmirê û bi serokê HEP yê Izmirê re daxuyaniyek çapemeniyê pêşkêş kîrin. Naif Güneş wiha axivî: "Em wek parti, di nav hewldana xurtkirina biratiya gelên Tirk û Kurda de ne. Yen ku tovê neyartîye dixin nav van gelan, wê rojek li hember dîrokê xwe tewbaran bîbînîn."

Partiya me ji bo biratiya Kurda Tîrkan wê panelek li dar bixe. Serokê HEP, yê Izmirê Hikmet Fidan ji bi vî awayî peyi: "Heyeta me ji bo hînbûna rastiya vê bûyerê li bajêr lêgerîn û lêkolîn kir û me tesbît kir ku li vir hinek nîjadperestan êrfîser gelê Kurd kîriye. Qeymeqam û hêzên Emniyeta Urlayê çavê xwe ji van êrişan re girtine û bi şeweyekî ji bo van êrişan bûne alîkar.


Ji ber çend mehan ve kampanyeke nîjadperest li hember gelê Kurd û metropolan hatiye vekirin. Ji bo vê kampanyayê ji giraniyê dane ser herêma Izmirê ji ber ku di bajarê metropolê de herî zehf Kurd li vir dijîn."



Dewlet, dixwaze Kurdan ji Izmirê derxe.

Dewlet neyarekî pirralî ye

● Hesenkêfê dikeve ber projeya GAP ê, ango projeya "Başûrê Rojhilatê Tirkîyê" bi binavkirin û xerakirina bajarê Hesenkêfê, dewlet dixwaze merkezeke mezin, ji merkezên pêşiyên Kurdan û kultura Kurdan nependî bike, kaniyek din ji yên derbasbûn û kultura me biçikîne û bi vî awayî çend rehê din ji yên dara me meqes bike.



Heste Egît

Li cîhanê merkezên kulturê û warêş şaristaniyetê hene. Van merkezan hêjayî û qiymetên mezin berpêyi mirovayetiye kirine.

Mezopotamya, Mîsir, Çîn, Yewnanîstan û Filistîn çendek ji van merkezên serekî ne.

Ev merkez pirr kevn in, dewlemend û reng bi reng in. Xizmet û suxra wan ji bo mirovayetiye bêpîvan e. Nayê wezinandin.

Herwiha ev merkez ji bo xelkên xwe serbilindayî û rûmet in. Şabas û fexr in piştgewînî û xwedesilbûn in.

Belê, Mezopotamya cihê fexr û serbilindayiyê ye.

Em Mezopotamyayî ne, em ji Mezopotamya têñ. Mezopotamya war û dayika herf û nivîsandinêñ ewil e. Helbestêñ ewil li vir hatine dariştin. Gundêñ ewil li vir ava bûne. Mezopotamya cihê efsaneyên ewil û gelek hêjahiyên bingehîn û yekemîn e.

Mezopotamya navça çûn û hatinê û pêrgîhev bûyînê ye. Gelekan ji xelk û bapîrêñ neteveyenî fro hevdu li Mezopotamya nasîne, li vir qetabêñ xwe li hev xistine û her yekî ji wan ji bo me, Rojhilata Navîn û cîhanê bi hezaran tişt hiştine.

Eser û berhemên tarîxî, bircû sera, eywan û pirêñ kevnar, keleb û sûrêñ heyamên derbasbûyi, şop û şeqlêñ hejmarek xelk hildigrin. Di avabûn û parastina van eser û berheman

de xwêdana Kurdan, Asûriyan, Kildaniyan, Ermeniyan û pîr xelkên din heye.

Eserên li Kurdistanê ne tenê malê Kurdan in, belê malê giş gelên navçê û cîhanê ne. Em bi çavekî wilo li Mezopotamya dinêrin û bi mîzênek objektif û însanî, xizmeta Mezopotamya û gelên vê navçê diwezinînin.

Xizmeta Mezopotamya heye, ev xizmet mezin e, xezîneke tarîxî ye. Mezopotamya tarîx e.

Kurdê ku navê Eskîfê yan ji Hesenkêfê nebîhistibe kêm in. Eskîfê yek ji kevintirîn bajarêñ Kurdistanê ye. Bi xwêdan û keda nîşen (nesîlen) berî me hatiye heta fro.

Hesenkêf xezîneke kulturî û dewlemendiyeke çendxelekî û çenddamarî ye. Ji zemanê Roma û Bîzansiyâ û bi vir de, di zemanê Merwanî û Eyûbiyan de Hesenkêf bûye merkezeke ïdarî û rola xwe lîstiyê.

Ev merkeza sedsalan iro ji bo qetîlam û şapeyeke kulturî bûye hedef. Dewleta Tirk, ji salêñ 60 û vir de Hesenkêf raserî çavêñ xwe kiriye. Li dora 30 salî ye ku bajar û dewlemendiya tarîxî ya bajêr talan dike, eser û berhemên bêhempa ji vir neqlî nav xwe dike û niha jî bi navê avakirin û pêşxitina Rojhilatê Tirkîyê, dewlet dê lehiya avê li bajêr rast bike û bajêr bi temamî xera bike.

Hesenkêf dikeve ber projeya GAP ê, ango projeya "Başûrê Rojhilatê Tirkîyê" bi

binavkirin û xerakirina bajarê Hesenkêf, dewlet dixwaze merkezeke mezin, ji merkezên pêşiyên Kurdan û kultura Kurdan nependî (winda) bike, kaniyek din ji yên derbasbûn û kultura me biçikîne û bi vî awayî çend rehê din ji yên dara me meqes bike.

Dewleta Tirk ketiye pey birrîna serê me û pey hişkîrina dara me. Ev dewlet neyarê dîrok û tarîxa me ye, bûye malşewêt û malwîrankarê weletâ me û dixwaze me bi saxî têxe turbê.

Dewlet ketiye pey kinêsa me, bêhna wê bi kuştina însanî me dernakeve, berê xwe dide ax, çiya û daristanê me. Ev jî têrnake, tîbûna dewletê bi van jî naşke û vê carê berê xwe dide miriyê me. Berê xwe dide derbasbûn û kultura me. Neyartiya dîroka bav û kalêñ me dike.

Helbet, neyartiya dîrok û derbasbûna me, xerakirin û tałankirina hêjahiyên me yên dîrokî, bombekirin û perçekirina hafiza me ye.

Nasîn û aşînayıya derbasbûnê û ya ketiye xezîna doh, vekrok û kilîta iro ye. İro pişta xwe dide doh û iro ji bo sibe dibe palik û sipartek.

Bêtarîxmayîn û ji doh qutbûyîn mîvandariya gorê û birayê mirinê ye. Pişî me evqas tişt naskirine û êdî em jî reş û sıpî ji hev derdixin, dewlet nema kare bi me. Harî û hovîtiya dewletê, wêrankerî û neyartiya kulturê hinekî ji, ji ber vê ye.



Ev merkeza sedsalan iro ji bo qetîlam û şapeyeke kulturî bûye hedef.

Yekitiya Jinen Welatparêzen Kurdistan (YJWK), bi navê Jina Serbilind kovareke 3 mehane derxist. Ev kovar her ji sê mehan carekê wê derkeve û têkoşîna jinê Kurd bîne ser ziman.

"Jina Serbilind" di hejmara xwe ya yekemîn ya 1.7.1992 an de, li ser derketina xwe wiha dînivîsîne; "Kovara me weşana YJWK ye û wê pîrsên jinê, cihê jinê yê di nava sis temen civakî de binivîsîne. Bi vê sedemê ji wê binivîsîne ku di dîroka civakê tebeqeyî de bê jin çawa hatiye ketin, hatiye kole kirin, biçûk hatiye dîtin, çawa hatiye warê mirovek tebeqeya duyemîn, çawa baweriya xwe ya bi kesaniya xwe winda kiriye û ew kesaniya jinitî ya alternatif ku azadîxwaz û têkoşer e, divê bi çi hawî be. Weki din hem di dema derbasbûyî de û hem ji iro, jinê bi şervaniya xwe cih gitine, wê pratîka wan vêke û neticeyên jê derkevin pêşkeshî xwendevanan bike û bi vê yekê re kovara me wê hîşyar be ku nekeve nava kêmâsi û şasîti, an çewtiyên hereketen jinan yên li cihanê dikevin navê û wê armanc bigre ku di van xisûsan de xwendevanen xwe safi (net) bike.."

Jina Serbilind di hejmara xwe yê yekemîn de xwediyê vê naverokê ye; YJWK ci ye? Di bin vê pîrsê de dînivîsîne ku di kongreya PKK ya 3 an de bîrîra avabûna YJWK hatiye sitandin û jinê Kurd di sala 1987 an de sazbûna vê tevgera xwe bi kîfxwesi hembez kirine. Pişt re armancen kar û xebata YJWK dînivîsîne.

Di rûpela 5 an de nivîsek li ser "Dîroka têkoşîna jinê Kurdistanê ya piştî salen 1970'an" heye.

Di rûpela 8 an de hevpeyvînek bi pîreka şehid Hemze

Di têkoşîna Rizgariya Neteweyî de kovareke nû

Jina Serbilind

- Yekitiya Jinê Welatparezê Kurdistan (YJWK), bi navê Jina Serbilind kovareke 3 mehane derxist. Ev kovar her ji sê mehan carekê wê derkeve û têkoşîna jinê Kurd bîne ser ziman. Girîng e hemû mirovê Kurdish Kovara Jina Serbilind bixwînin, bidin xwendin û lê xwedî derkevin. Ji ber ku rizgariya civakê incax bi rizgariya jinan mumkun e.

(Hasan Bindal) re heye. Di vê nivîsî de pîreka şehid Hemze dibêje "Mîrin pîr dijwar e, lê tu car min nehişt ku dijmin di min derxe."

Di rûpela 11'an de namayek komek jinê gerîla heye, bang li tevê jinê welatparez yê li derveyî Welat dîkin û di dawîya namayea xwe de dibêjin, "Bi vê baweriye, em tevê jinê welatparezê Kurdistanê vexwendî dîkin ku berpirsiyâr û wezifeyen xwe yên demî bi ruhek berxwedanvanî pêk bînîn.."

Di rûpela 12 an de, "Di dîrokê de jin" bi zimanê



Kurdistan kadını özgürlük yolunda!



Ülkemizde yoksulluk denilen zengin yaşam

Tarihte Kurt kadını

Ölümacidir, ama bunu hiçbir zaman düşmana hissettirmedim...

Kovara Jina Serbilind

YJWK nedir?

man de jineke ji jinê ku di refen tewra pêsemîn de cih girtiye ye."

Kovara jina Serbilind, di rûpela 19' an de bernameya YJWK weşandiye. Di beşê yekemîn deli ser van xalan dise kine: "Di seranseriya dîroka civakan de pirsa jinan", "Rizgariya jinan".

U di rûpela dawî de belavokek "Komeleya jinê Kurdistanê cih digre. Sernivîsa vê belavokê "Komeleya jinê Kurdistanê çima dameziri?" ye.

Bê sik, derketina kovara Jina Serbilind, ji bo jinê Kurdistanê gavek girîng bû. Iro jinê Kurdistanê di refen şerê rizgariya neteweyî di cihê xwe li rîzên pêsemîn digrin û bi dar û keviran, bi qîr û îlandinan bi ser tank û topêneyaran e dimeşin.

Dîsa jinê Kurdistanê ew zarokên xwe yê bi buhayiya xewa şevan û bi şîrê sipî xwedî kirine weke beranen qurbanê di riya Serxwebûn û azadiya Kurdistanê de didin.

Her ku xor tek Kurdistan şehîd dibe pêşî kezeba dayîken Kurd diperite. Lî dayîken Kurd şewata dile xwe pêş neyaran nakin û bi îlandinan li ser qebra şehîdan govenda azadiyê digrin û bi serhildanan dimeşin ser kelehen mijokdariye, singa xwe ya têr kul û keder li hember gulleyen dijminan vedikin û bi serbilindahiyek bi rûmet dimeşin.

Girîng e hemû mirovê Kurdish Kovara Jina Serbilind bixwînin, bidin xwendin û lê xwedî derkevin. ji ber ku rizgariya civakê incax bi rizgariya jinan mumkun e.

Navîşana kovara Jina Serbilind ev e: Gustav Heineman str. 7 5090 Leverkusen 1 Deutschland/ Tel: (0) 214/75859 Buha 2,-DM

Servan

'Komela Jinê Kurdistanê çima dameziri?'

Komela Jinê Kurdistanê ji bo armancen li jêr dameziriye:

1- Nasdana têkoşina jinê Kurdistanê yên di nava rîzên têkoşîna neteweyî Kurdistanê de, bi awira gelemeperiya cihanê ya peşveçûyî û demokratîk.

2- Alîgiriya jinê Kurd ên ku di bin sistema dagîrkeriya dijmin de têr çewsandin paş ve hatine hiştin, ji ber şehîdbûna mîrên wan zarokên wan sêwî mane.

3- Perwerdekirina zarokên Kurd bi çanda neteweyî, bi ziman, govend, muzîk û hwd. Li vandina wan û xurtkirina girêdanen wan bi niştiman re.

4- Berhevanîna jinê ji Kurdistanê yên ku li Ewrûpayê dijîn: Rêxistinkirin û perwerdekirina wan li ser bingehêne rizgîxwaziya neteweyî.

5- Berhevanîna malbaten

Kurd ên li Ewrûpayê dijîn; bi hevdu nasdana wan û di nava malbatan de serdestkirina welatpareziye.

6- Xwe mijûlkirina bi pîrşîgirêkîn civakî, aborî û dadmendî yên jinê Kurdistanê yên ku li Ewrûpayê dijîn: Piştgiriya wan ji bo di jiyana civakî de bikaribin rola xwe bileyizin.

7- Pêşvebirina pêwendiyen bi komên jinan re yên ji Kurdistanê, Tirkîye û welatên din, pêşvebirina yarmetiya ji bo hevûdin.

8- Li beramberê bîr û baweriye ku jinan biçûk dibînin, nizmdikin û hwd. Pêşvebirina bîr û baweriye demokratîk.

9- Karguzariya ji bo jinê Kurdistanê û hemû jinê cihanê yên bindest: Piştgiriya têkoşîna jinê welatparez û demokrat ku azadiyê dixwazin:



Têkoşîna neteweyî ji herkesi bêtir jin guher. Jina Kurd û di bûyeren civakî de roleke girîng difize.

Rêzana rastnivîsandinê pêwist e

● Bêrêzanî di gramerên Celadet û Kamran de ji gelekî zelal û diyar in. Ji ber vê yekê ji, di vî warî de, ango di warê îmlayê de, iro hin ji belavbûnî û tevlîheviyeke mezin heye. Her nivîskar li gor devoka xwe an ji, bi gotineke din bi devoka diya xwe dînivîsine û israr ji dike û dibêje "devoka min ya rastîşin e." Ji ber ku her kes ji diya xwe zimê hîn bûye.

M. Xarpeti

Wek ku tê zanîn, Celadet û Kamran Bedirxan hîm û skeleta gramerê avêtine. Gramera Bedirxanan bi hîn kîl û kêmasyîn xwe ve, gramereke hemdem û nûjen e. Gramera wan bi xwe têra zimanê Kurdî dike. Bedirxanan gramereke wilo çekirine, ku bi gremera zimanê fransî re muqayese û berhevudû danîne. Ev tiştekî gelekî mezin û hêja ye, ku zimanê kurdfî yê devkî bi zimanê fransî yê ji hezar salan ve nivîskî û edebî ye re hatiye muqayese kirin. Lî hezar mixabin, ku Bedirxanan ji ber wext û îmkânên xwe nikaribûne rîzana rastnivîsanda bêjeyan (îmla kîlavuzu) binivîsîn. Di vê warî de bê serûberiyek heye. Mirov dema li kovarê Hawarê, Jîna Nû û Ronahî dinêre vê bê serûberiyê bi çavekî vekirî dibîne. Her bêjeyek bi çend cureyan nivîsandin. Herwiha ev bêrêzanî di gramerên Celadet û Kamran de ji gelekî zelal û diyar in. Ji ber vê yekê ji, di vî warî de, ango di warê îmlayê de, iro hin ji belavbûnî û tevlîheviyeke mezin heye. Her nivîskar li gor devoka xwe an ji, bi gotineke din bi devoka diya xwe dînivîsine û israr ji dike û dibêje "devoka min ya rastîşin e." Ji ber ku her kes ji diya xwe zimê hîn bûye. Dewlet û dibistanê me tune ne, ku em hemû bi yek devokekê binivîsin. Wê demê ci dimîne, devok ji kurdiya gundê me an ji ya diya me dimîne...

Di vî warî de heval Hüseyin Deniz çend nivîsand. Ew di nivîsarê xwe de, li ser rastnivîsanda kurdî gazin û rexneyen xwe dike. Ez bi xwe heq didim heval Hüseyin û di eyñî baweriyê de me. Lî, di hejmara rojnameya Welat ya 21'ê de, heval Hüseyin li ser rastnivîsanda bêjeya lewra disekine. Ew paşê çarîneke (dörtlük) ji Ehmedê Xanî digire û dibêje:

"Lewra rast e. Lî em dinêrin di gelek nivîsandinan de bi nezanî peyva ji lewra tê nivîsandin. Lewra bi tirkî cüñkü ye. Gava ku em bêjin ji lewra dibe cüñküden..."

Ev dîtin ji çend aliyan ve ne rast e û çewt e. Gotina "lewra", "lewra" an ji, "ji

leuvre" dikeve cureya daçek (edat) an. "Lewre", an ji "ji leuvre" hevwateya (sînonîma) "loma" û "ji ber" e. Di nivîsarê klasik de bêtir "lew" hatiye bi kar anîn. Lî, rast e, "lewra" ji kêm caran bi kar anîne. (Binêr dîwana Melayê Cizîri weşanên Roja Nû, rûpel 98 û Şêx Sen'an, Feqê Teyran weşanên roja Nû rûpel 81, 88, 99.) Wiha ji diyar dibe ku rastiya bêjeyê "lew" e û "ji" û "re" ji daçekên wê ne. Heger mirov bi awayê grametikî binivîsine, divê wiha bê nivîsandin: "Ji lew re" Wek: Ji te re, ji me ve, ji ber ve û, hwd. Mirov nikare ji tere, ji meve û ji ber ve binivîsine.

TAYBETIYÊN DEVOKÎ Ü HERÊMÎ

Lî, çîma hînek dînivîsînin "lewra û hînek ji "leuvre?" ev "re" û, "ra" ji devokê tê. Wek ji te re û ji te ra. Di mal da û di mal de... Eynî wek "ji leuvre", "ji ber ve" ji, li gelek herêmîn Kurdistanê "ji" yê nabêjin, bi tenê "ber" dibêjin. Di zimanê axaftinê de "ji" ketiye û hatiye kurt kirin. Ne bi tenê ji ber, herwiha li gelek herêmîn, daçekên pêş nayêni bi kar anîn. Wek ji te re, dibe te re, bi te re, dibe te re, li malê dibe malê û hwd. Kamran Bedirxan, "lewra" û "ji leuvre" du daçekên cuda dibîne û herduyan ji kiriye koma "Gihanek û biwêjîn gihanekî." (Binêr Rêzana Zmanê Kurdfî rûpel 58, Kamran Bedirxan Paris 1971) Di Kovarê Hawar û Ronahî de ji, "ji leuvre" hatine nivîsandin (Binêr Hawar hejmar 32, nivîsara rewşa Dînyayê, rûpel 15 û Ronahî, rûpel 19) Dîsa Cegerxwîn "ji leuvre" bi kar anî ye. (Binêr Tarîxa Kurdistan 1, rûpel 54, paragraf 5.)

Hînd-Ewrûpî zimanêni bi daçek in, ku jê re preposition tê gotin. Tirkiya wê edat e. Di tirkî de daçek hene, lî zimanê tirkî ne zimanekî bi daçek e. Mirov qet nikare zimanê kurdfî bi yê tirkî re muqayese bike an ji bi tirkî kurdfî bifikire, bibêje leuvre cüñkü ye û ji leuvre ji dibe cüñküden. Ji ber ku zimanê kurdfî zimanekî Hînd-Ewrûpî ye "ji" bi tenê nabe "den" heliyê tirkî "ji" di kurdfî de çend rewşan diyar dike. İstiqamet, rewş, sedem

malîk, aît...

Em bêr ser mînaka Ehmedê Xanî. Rast e Ehmedê Xanî ev daçek (edat) "lewra" nivîsandiye. Heta ne tenê Ehmedê Xanî, herwiha Meleyê Cizîri, Feqê Teyran û helbestvanê me yên klasikîn din ji, di helbesten xwe de "lewra" nivîsandine. Wan wek "lewra" daçekên bi da, ra ji nivîsandine. Wek ji te ra, di mal da û hwd. Wek tê zanîn di helbest û stiranan de gelek caran daçek nayêni bi kar anîn. Heta ji derê daçekan carnâni kîte û carnâni ji tip nayêni nivîsandin. Helbestvan û nivîsandin me yên klasik hema hema hemû ji herêma Botan û Hekariyê ne. Wan devoka herêma xwe bi kar anîne. Berf her kesî Bedirxanan hemû klasikîn kurdfî xwendine. Hem ji bi kûrahî. Hînek ji wan kirine tipen latînî û di kovara Hawar û yên din de weşandine. Lî bi vê yekê re ji dîsa Bedirxanan li ser hemû devok û zaravayên kurdfî xebat kirine.

Gramerên xwe bi awayeke zanyarî, ne bi devoka herêma xwe, bi ya gelempêrî bi kar anîne. Bi detayî li ser pirs û pirsgirêkîn ziman rawestine. Bi zimanê Hînd-Ewrûpî re muqayese kirine. Lî ne bi tirkî û bi erebî re.

DÎ RASTNIVÎSÎNÊ DE YEKITÎ

Helbet problem bi tenê, ne gotina "lewra" ye. Bi sedan gotinê wiha hene, ku bi çend cureyan têne nivîsandin. Min du sal berê di vê mijarê (konuyê) de, di kovara Berbangê hejmar 70, di rûpela 26 an de, bi navê "Kompîtur û Zimanê Kurdfî" nivîsarek nivîsandi bû. Min di wê nivîsara xwe de behsa problemen îmlaya kurdfî kiribû. Min dabû diyar kirin ku divê komîteyeke otorîter pêk bê û ew pîrsîbîn rastnivîsanda kurdî tespît bike û bike programeke komîturê. Wê demê mirov programma rastnivîsandinê dike serê komîturê, dema mirov nivîsarek dînivîsine, di dawî de komando dide komîturê û dibêje çewtî û şaşiyân rast bike; edi ew bi xwe rast dike. Niha bi zimanê Ewrûpî programen wiha yên rastkirin hene. Pişti ku nivîsarê xwe diqedînin, komando didin

komîturê, ew çewtî û şaşiyân binivîsine, wiha bê serûberiyek mezin derdikeye holê. Her kes xwe otorîte hesab dike û qet pêşniyâr û rexneyan ji qebûl nake. Ev karê kolektivî û otorîte ji dikeve ser milê Enstituya

Kurdî. Berhevkirina kesen zimanze, bi metodê zanya-ri û bi xebateke kolektivî dikare di demekê gelek nêz de prensibîn rastnivîsandinâ kurdî deyne. Ü encamê wê wek pîrtûkeke rastnivîsandinâ (îmla kurali) çêbîke û bike xizmeta gelê Kurd. Niha ya herî pêwist ne gramer û ferhengen kurdî û zimanen din in. Ya herî pêwist tespît û amadekirina rastnivîsandinâ kurdî ye. Heger iro li herêma


Enstituyê ev îmkanen madî, manevî û kadro tune bin ji mirov dikare vê xebata han li der pêk bîne û pêşkêşî Enstîtuyê bike.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Cepераст:

1-Ziman, zanyar û nivîskarê Kurd. Di sala 1909 an de, li gundekî Qersê ji diya xwe dibe, di sala 1918 an de tevlî malbata xwe koçi Ermenîstanê dikin. Di 1928 an de, li 8 Lenîgradê dest bi 9 xwendina zanîngehê 10



dike û di 1938 an de li wê zanîngehê dibe mamo. Xebatên wî yên li ser ziman pişti van salan xurt dibe û kîtebe bi navê "Sazmânia çêkîrina fîlén bargiran di zimanê kurdfî de" diweşîne. Li ser ziman gelek pîrtûkîn wî yên din ji hene. Di sala 1985 an de çû ser dilovaniya xwe. Di wêne de tê dîtin. 2-Dîl, girtî/ Celebek tîrêj, di van salen dawîn de, di gelek waren teknikî de tê bi karanîn. 3-Mirovîn ku nêzîkayî di navbera wan de heye/bîvir/ Rengpişeyek awakî 4-Aborî/ Bernavê helbestvanî Kurdfî ku bi kurdfî distire 5-Zilamîn xwendî zarok/ Tişîn ku têgîhistina hebûna wan bi hiş û bîr tê pejirandin 6-Bî zimanê biyanî kor, yên ku çavên wî nabînîn/ Sembola Aşûriyan, navê Musul a kevin/Taybetiyeen ku ji dê û bavan derbasî zarakan dibin 4-Li Agirî navê deştekî/ Celebek helbestan ku ji bo şanoyen bi müzik tê amadekirin 5-Payîtexta Bulgaristanê/ Sembola Amerikyûm 6-Eşîret, qebile/ Niwêner, parlament 7-İmbara ku tê de ka tê vesartîn/ Alfebeva müzikê 8-Îterbiyûm 7-Di kurdfî de xwendina tîpek/ Celebek xweşoyê 8-Payîtexta Brezilyayê/ Pêlav 9-Ne hergav/ Bê av 10-Navçeyeke

dîrokî, girêdayiyê Adiyemanê ye. Ew ji wek Hesenkêf dê di binê ava Feratê de winda bibe

Serejér:

1-Navê herêma ku bû sebebê şerê di nav Ermenî û Azeriyan de/ Sembola Kalsiyûm 2-Di notayê de dema sekne/ Navê mekîna ku ji bo sinema û videoyê wêneyen bi tevger dikşîne 3-Payîtexta Asûriyan, navê Musul a kevin/Taybetiyeen ku ji dê û bavan derbasî zarakan dibin 4-Li Agirî navê deştekî/ Celebek helbestan ku ji bo şanoyen bi müzik tê amadekirin 5-Payîtexta Bulgaristanê/ Sembola Amerikyûm 6-Eşîret, qebile/ Niwêner, parlament 7-İmbara ku tê de ka tê vesartîn/ Alfebeva müzikê 8-Îterbiyûm 7-Di kurdfî de xwendina tîpek/ Celebek xweşoyê 8-Payîtexta Brezilyayê/ Pêlav 9-Ne hergav/ Bê av 10-Navçeyeke

BERSİVÊN XAÇEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ

Çepérap: 1-Osman Sebî 2-Remzî/ Seul 3-Ew/ Aka/ Rb/ Ud 4-Mandela/ Lîra 5-Alî/ Leşker 6-Sî/ Mîr 7-Dara/ Tî 8-Şinasî 9-Os/ Nota 10-Rali/ Arî

Serejér: 1-Oremar/ Şor 2-Sewal/ Dîsa 3-Mm/ Nisan 4-Azad/ İranî 5-Nikel/ Aso 6-Alem/ İta 7-Es/ Aşit/ Ar 8-Ber/ Krîz 9-Ruble 10-İl/ İr 11-Ur 12-Xedar

NEQUSKAmadekar
Aram ÇemNe zilmê bikin,
ne jî zilmê qebûl bikin.

Hz. Muhammed

Çawa bû welatparêz?

Du hevalên kevn pişti çend salan hev û din li bajarê Amedê dibînin. Ji hevalan yek li Universîta Dicleyê xwendevan e û yê din jî, li derveyî welat dimîne. Xwendevanê Universîta Dicleyê oldarekî (dîndarekî) yeman e. Hevalê wî yê derê welêt jî, welatparêzeki xurt e. Herdu heval pişti munaqeşeyen dûr û dirêj bi awayekî nexwes ji hev diqetin.

Pişti salekê herdu heval dîsa li bajarê Amedê li avahiyeye Kurdan hev û din dibînin. Hevalê derê Welêt şas dimîne. Ji ber ku hevalê wî yê oldar bûye welatparêzeki dijwar. Yê derê welêt, ji hevalê xwe yê xwendevan dipirsê û dibîje:

Heval çawa bû? Bi rastî ez meraq dikim, te çawan dev ji wan dîtinê xwe yê berê berda?

Bersîva xwendevanê Universîta Dicleyê wiha ye:

Min çendekî berê, xewneke xweş dît. Min dît ez miribûm. Ez pişti gelek der û deveran hatim ber Pira Selatê. Li ber Pira Selatê çend melaiketan ifadeyê



min girtin, hesab-kitêbê min dîtin û gotin,

Fermo, tu dikarî herî cenetê, Tu qisûr û gunehêne te tune ne. Te nimêja xwe kiriye, rojiya xwe girtiye. Te xeyr û xeyratê xwe belav kiriye, cenet heqê te ye.

Ez bi keyf û şayî ji Pira Selatê derbas bûm û ber bi cenetê ve dicum. Nêzîkî deriyê cenetê min dît ji nişka ve se-

rokê PKK' ê Abdullah Ocalan derket pêşîya min û ji min pîrsî:

De bêje ka te ji bo welatê xwe ci kiriye?

Min tû tiştek nekiribû. Ji ber wî jî, ez bê bersiv mam. Hema wî jî, ez girtim û avêtîm nav agirê cehnemê. Belê, ji wê rojê vir ve, min bawer kir, ku heger mirov ji bo welêt kar neke, deriyê cenetê jî nabine!..

J.Diyarbekirî

Piştî ku ji axurê dernakevî, ker çêtir e!

Celal Telabanî û Mesûd Barzanî ji Dewleta Tirk pasa-porda diplomatian girtin. Bûn diplomatîn Dewleta laik û demokratik a Tirkîyê. Maşalah diplomasîya Komara Tirkîyê ket destê Kurdan (!) Hikmet Çetinê Liceyi, xwedî li

Telabanî û Berzanî derket û bi transferekî gelekî erzan ew girtin wezareta xwe. Pasaporta Telabanî û Berzanî meselekî anî bîra min:

Li derekî mirovek hebû navê wî Ker bû. Ker heta ku nezewicî û zarokên wî çê

nebûn, navê Ker jê re tu problem çê nekir. Lî piştî ku zarok marokên kerê çê dîbin û dîbin mezin, ji kerê re serêşî peyda dibe, lew re zarokên wî naxwazin xelk ji wan re bêje zarokên Kerê. Piştî gelek munaqeşe û xirecire zarokên Kerê bavê xwe qane dikin, ku navê xwe biguherîne. Zarokên ker xwarin marin çê dikin û cîranen xwe vêdixwînin xwarinê. Piştî xwarinê dibîjin: "Gelî cîranan bavê me di hizûra we de navê xwe diguherîne"

Ker dibîje:

-Belê, heta niha navê min Ker bû, lê ji iro pê ve navê min Ga ye!

Zarokên wî şas dîbin û diben:

-Na bavo na! Me got qey, emê te ji axurê derxin. Piştî ku tu ji axurê dernakevî Ker çêtir e.

Niha yê Telabanî û Berzanî jî ev e. Me got qey ew dixwazin ji koletiyê rizgar bibin. Lî, way xuya ye, ew xwedî ruhekî kole ne. Baş e, piştî ku dixwazin kole bîmîn, bila ji kerema xwe re, ji Saddam re koletiyê bikin, qe nebe zirara wan nagihîje Kurdên Bakur.

J.Diyarbekirî



serbest

serbest

serbest

TİR

Musa Anter



Welat

M a Kurdan li ser welatê xwe ci nekirine û ci negotine? Lî ci fêde... Weke Seydayê Cegerxwin ku dibêje:

Welatê me tev ziv û zér e

Lê çibkim maye ji xelkê re

Faik Bucak jî li ser welat wiha dibêje:

Sonda me mirin e di rîya te de welat

Kefen kirasê me ye mirin xemîl û xelat

Şairê Kurd Abdurahman Rahmî, di helbesta xwe yê "Hesîri" yê de dibêje:

Eşqa welat, eşqa welat

Te cerg û pêmagê me pat

Em ji sala 1915' an re dibêjin "sala mihaciriyê". Lî bi rastî, em Kurd tim di welatê xwe de jî mihacir in. Tewer niha Tirkê mihacir, ji me re dibêjin "sığınmacı", yanî Tirkan bi xêra xwe Kurdên Zaxo li Silopî hewandine. Lî ma ezê ci bêjim. Çavê fe-lekê kor be.

Sala mihaciriya me ya menşûr, dema ku Osmanî li ber Uris belav bûn û reviyan. Uris heta Bedîsê hatin. Kurdan dev ji mal û milkên xwe berdan û bi çolê ketin. Sê par ji wan ji birçibûnê û ji nexweşînê mirin.

Ez ew sala mihaciriyê çêbûme. Paşî ku ez bûm şeş-heft sa-li jî, hê mihacir li gundê me hebûn. Hesenê mihacir cotkarê me bû. Ji gundekî Bedîsê bû. Carna Heseno eşqa welatê xwe bi stiran digot. Erê stiran bi temamî ne di bîra min de ye. Ev heftê sal derbas bûn. Lî serê stirana wî wiha bû:

Welat çiya billind in te nabînim

Dest davêm gul û beybûnan nacivinim

Welat, welato, welato

Bîrîm li welatê xeribiyê

Min li jor jî gotibû, stirana Hesenê mihacir dirêj bû, lê ez gi-bikim, evqas di bîra min de maye. Xwezî ez jî bûma, wê tev de di bîra min de bimaya.

Lî birakno! Bila pîrs di nav me de be û neyar nebihîzin, heftê sal jî ne hindikin haaa!..

Keç û xortên Kurdan, ma ez ji we re ci dirêj bikim. Gerek hûn zanibin, dayika bi rastî welat e.

Heta ku welatê mirov di destê xelkê de be, dayika me jî wê di "sorgu" yê de be.

Edî dayika reben emanetê jop û "tîman" e.

Wek bezê ku tu teslimî psîkê bikî.

Elamet neman, faşîzm berkemal e

Vê heftiyê, elametê qiyametê tunin.

Hûn zanin ev du heftê ne elametê qiyametê destpêkiribûn û bi pêşkêşkirina van elametan me hûn pirr tîrsandibûn. Bi rastî ne hûn tenê, em jî gelek tîrsyan. Me digot ha qiyamet rabû ha qiyamet rabû. Lî netîrsin edî, ev elamet sekînîn. Dîsa her tiş bû wek xwe û kete rewşa xwe ya berê. Belê vê hefteyê tu elametê qiyametê ku me şas bihîlin ne qewimîn. Mesela tu siyasetvan an jî berpirsiyare dewleta Tirk behsa hebûna Kurdan nekirin. Tu xayînen Kurd, Kurdayetiya xwe qebûl nekirin. Mesela wek her car lawê xayîn dîsa dest û piyê Demirel û genaralên Tirk alast û nasnameya xwe fîrot û lê da çû Surî, da ku berê xayıntiya xwe fireh bike. Wekî din rewşa çapemeniyê jî normal bû. Dîsa xeberên hemû rojnameyên Tirk %100 derew bûn. Hûn zanin hefteya buhûrî xebereke rast di van rojnameyan de hatibû dîtin û herkesi şas û mat hûştibûn. Di wan warê din de ji dîsa her tiş normal bû. Dîsa çend rojnameyan hatin kuştin wek hercar ji aliye hîzb-i dewletê ve. Normalîzasyon li her derê Kurdistanê ji berkemal bû. Dîsa çend gund hatin bombekirin û çend sed Kurd hatin girtin û êşkena xwe ya bi rêk û pêk dîtin. Li İstenbolê jî "055" ziyyaretan xwe yê piştî nîvê şevê pêk anîn û rojnameyan Tirk destê xwe ji polîsîn dewleta xwe re li hev dan. Wekî din rojnameya Yeni Ülke jî dîsa hat komkirin. İsmail Beşikçi jî çû dadgehî û wek hercar ifâda wî hat girtin. Ev rewşa Tirkîyê ya normal Demirel dîsa bi nutuqeke demokrasiyê anî ziman û generalan dîsa hefsarê lawê xayîn Hikûmet Çetin xistinê stîyê wî, nalê wî nû kirin, kurtanê wî lê kirin û ji bo danasına demokrasiya Tirkîyê ew şandin nav dewleten Ewrûpî.

Werhasî, em naxwazin zêde dirêjkin, bi kurtî her tiş kete rewşa xwe yê normal. Yê ku ji qiyametê tîrsiyabûn bila edî netîrsin.

Jiyana berê dîsa berdewam û faşîzm berkemal e.

Salvegera Peymana Sewrê

● Di 10'ê Tebaxa 1920 an de, di navbera dewletên mutefikan (İngiliz, Fransız, İtalya) û dewleta Osmanî de peymana Sewrê çêbû. Li gor xal û bendê 62-64 yên vê peymanê, bîyar hat standin ku, Kurdistanek otonom an jî serbixwe bê damezirandin.

Seyîdxan Kurij

Di 10'ê Tebaxa 1920 an de, di navbera dewletên mutefikan (İngiliz, Fransız, İtalya) û dewleta Osmanî de peymana Sewrê çêbû.

Li gor xal û bendê 62-64 yên vê peymanê, bîyar hat standin ku, Kurdistanek otonom an jî serbixwe bê damezirandin. Dewleta Osmanî di bin serokatiya İttihat û Terakki de, li cem dewleta Almanî ket şerê cîhanê yê yekemîn.

Lê dewleta Osmanî ev şer windakir. Tevgereke netewuya Kurd di serê sedsala bîstan de ji aliyê îdeoloji û rîexistinî ve pêşve çûbû.

Di sala 1898 an de, li Qahîre Rewşenbirêñ Kurd di bin serokatiya Mikdat Bedirxan de rojnameya "Roja Kurd" paşî ji "Hatawe Kurd" weşandin.

Dîsa wan salan li İstenbolê "Kürt Teali Cemiyeti." (Komela Rizgariya Kurd) û "Kürt Teavun Cemiyeti" (Komela Teavuna Kurd) sazbûn.

Ev komel û rîexistinê Kurd di pey damezirandina meşrûtiyet a duymîn de saz bûbûn.

Lê belê İttihat û Terakî demokrasî û azadî zû ji bîr kir. Dest bi zilm û tadeyê kir. Rojname û rîexistinê Kurd

hatin girtin.

Di 10'ê Tebaxa sala 1920 an de, di navbera dewletên mutefikan (İngiliz, Fransız, İtalya) û dewleta Osmanî de peymana Sewrê çêbû. Li peymana Sewrê bi navê Kurdan Şerif Paşa beşdar bû. Şerif Paşa bi destê "Kürdistan Teali Cemiyeti" hatibû bijartin.

Di vê peymanê de pirsa Kurdistan jî hat axaftin. Ji bo pirsa Kurdistan li gor xal 3 û bendê 62-64 yên peymanê, bîyar hat dayîn.

1- Benda 62 an wiha bû: Bi destê hikûmeta İngiliz, Fransız û İtalya wê heyetek bê bijartin. Ev heyet wê li İstenbolê bimîne û derên ku Kurd lê henin jî bo wan deran plana otonomiya hundir wê bê amade kirin. Bi vê planê heqîn Asuriyan, Keldaniyan û ew miletên din jî wê bê dayîn.

2- Benda 63: Dewleta Osmanî qebûl dike ku, qerara komîsyonê heta 3 mehan bîne cih.

3- Bendê 64: Pişti salekî, eger miletê Kurd bixwaze ku serbixwe be û bîyarâ bide rîexistina Neteweyen Yekbûyi, Neteweyen yekbûyi mecbûr e ku, serxwebûna Kurdistan qebûl bike.

Dewleta Tirk divê hemû quwetên Tirk ji Kurdistanê derxîne. Li ser derxistina quwetên Tirk ji Kurdistanê, divê di navbera miletên mu-

tefik û Tirkîye de peymanek çêbe. Pişti serxwebûna Kurdistan, eger Kurden Musul bixwazin ku, daxilê Kurdistan bin, dewletên mutefik nîkarin li hember bisokinîn.

Weke têzanîn peymana Sewrê nekete jiyanê. Bi vê peymanê sînorê Kurdistan û Ermenîstan tevlîhev kiribûn. Çend bajarêñ Kurdistan daxilê Ermenîstan bûn û Musul daxilê Kurdistan nebû. Ji ber wê gelê Kurd bi peymana Sewrê dilşad nebûn.

Xuya ye ku, derdê dewletên mutefik gelê Kurd û Ermenî nebû. Ew ji bo menfaatên xwe şer dikirin. Pişti vê peymanê, di 1923 an de peymana Lozan çêbû û li wir Kurdistan bû çar perse.

● Weke têzanîn peymana Sewrê nekete jiyanê. Bi vê peymanê sînorê Kurdistan û Ermenîstan tevlîhev kiribûn. Çend bajarêñ Kurdistan daxilê Ermenîstan bûn û Musul daxilê Kurdistan nebû. Ji ber wê gelê Kurd bi peymana Sewrê dilşad nebûn.



Li peymana Sewrê bi navê Kurdan Şerif Paşa beşdar bû.

2- 161

پز خوش

Ked Pi

مراجع: پز خوش
1920 - پز خوش
پز خوش

روزگرد

سازمان اسناد و کتابخانه ملی
جمهوری اسلامی ایران

۱:۰۰

۲:۰۰

۳:۰۰

۴:۰۰

۵:۰۰

۶:۰۰

۷:۰۰

۸:۰۰

۹:۰۰

۱۰:۰۰


۱۱:۰۰

۱۲:۰۰



سازمان اسناد و کتابخانه ملی

شوف سنبس] بابل جو شهید ایالات متحده نامه تو ۱۹
Rojnameya "Roja Kurd"



Li peymana Sewrê, parkîrîna İmparatoriya Osmanî

Bi nivîskarê romana Bineş Egal Vanîkê Elîxan re hevpeyvîn:

'Kurdên Sovyeta berê bi xwe hisiyan'

Hûn dikaribin ji bo xwendevanen me xwe bidin nasîn?

Ez ji Kurdên Sovyeta me, li Êrivanê dijim. Karê min nivîskari ye. Helbesten min hene. Li ser Bineş Egal min romanek nivisiye. Navê vê romanê "Bêrivan" e. Xebatên xwe yên nivîskariye li ser bingeha têkoşîna neteweyî ezê bidomînim.

Wek rewşenbireki Kurd li ser têkoşîna ku iro li Kurdistanê bilind dibe hûn ci difikirin? Haya Kurdên Sovyeta berê çiqas ji têkoşîna neteweyî heye?

-Gelek Kurdên Sovyeta berê yên ku bi xwe hisiyanne bi dil û can bi têkoşîna çekdarî ya Bakurê Kurdistanê ve xwe girêdayî dibînin û ji bo piştgirî û aîlîkariye amade ne.

Hûn di nav Ermeniyan de dijîn, têkiliyîn we û Ermeniyan çawa ne?

-Hevbeşîya me û Ermeniyan ew e ku em herdu gel ji hatine qetil kirin. Pirr caran, dijmin em berdane hev, berê me dane hev û din.


Ji bo xelasiya me herdû gelan, pêwist e em bi hev re yekîtiyê saz bikin û dostaniya xwe xurt bikin.

Ji ber ku pirsa me û ya Ermeniyan bi hev ve girêdayî ye; bêî me ew rizgar nabîn, bêî wan ji em rizgar nabîn. Pirsa me û ya wan di bingehê de yek in.

Rewşa Kurdên Sovyeta berê çawa ye? Ji bo çareserkirina pîrsen xwe yên neteweyî tu xebatên we hene an na?

-Rewşenbireni Kurd ên Ermenîstanê di mehîn Nisan û Gulanê de du konferans li dar xistin.

Ya ewil 2' ê Nisanê çêbû. Ev konferans li ser hîndarî bû. Hewlidanê damezrandina



Li gor dîtina min, Berzanî û Telabanî eşîr in, li pey berjewendiyê xwe yên kesane ne. Girêdanê (têkiliyîn) wan bi dewletê dijmin û xayîn re zêde çedibin. Em Kurdên Sovyeta berê ji baş dibînin ku ji PKK ê pêştir tu rêxistin xwe bi gelê Kurd nedane qebûl kirin. Bi xurtbûna hêza Partiya Karkerê Kurdistan, rûçikêñ rêxistinê eşîr û girêdanê wan ên bi dijmin re derdi Kevin ber çavan û gelê Kurd ji êdî rêxistinê baş û feodal ji hev vediqetîne û ber bi partiya xwe ve diçê, tê de cihê xwe digre, ji bo serxwebûn û azadiya xwe.

yekîtiyê di vê konferansê de destpêkirin.

Di konferansa me ya duyemîn de (7' ê Gulanê) yekîti ava bû. Ev yekîti di nav rewşenbireni Kurd ên Ermenîstanê de damezîri. Armanca me ew e ku em yekîtiyê di nav rewşenbireni Kurd ên hemû Sovyeta berê de çêbikin.

Berê, bi navê "RO" yekîtiyek di nav me de hebû. Piştî vê konferansê, me YRKE (Yekîtiya Rewşenbireni Kurdên Ermenîstanê) saz kir. Bi serokatiya Şakiroye Xudo ev yekîti ji 26 rewşenbireni Kurd afîri. Bi hezaran Kurd hîna di destpêkê de, bûn endamên vê yekîtiyê.

Girîngiya van konferansê we ci ye? Di sazkirina yekîtiyê de armanca we ya bingehîn ci ye?

-Ev yekîti simbola yekîtiya Kurdên Ermenîstanê ye, xurtkîrina biratiya Kurd û Ermeniyan e û parastina orf û edetên Kurdên Sovyeta berê ye.

Ev yekîtiya ku me ava kir bi Eniya Azadiya Kurdistan ve hate girêdan û bi hev re dê kar

bikin.

Emê hewl bidin xwe da ku mafêni xwe yên berê bixin destê xwe. Hûn dizanin di navbera salen 1923-1930 de Kurdistan Sor hatibû damezrandin. Hingê rojnameya Kurdistan li wir derdiket. Di dawiyê de Stalin, Bagirov (Azeri), Yejov û Beriev, Kurdên Kurdistan Sor berê dad ji hev û din belav kirin, ew ji hemû mafêni wan ên neteweyî bê par kirin. Yekîtiya Rewşenbiran dixwaze van mafêni berê paş ve bistîne.

Ji bo paş ve standina van mafan tu xebatên we yên çekdarî hene?

-Niha hêzên Kurd ên çekdar ku girêdayê Eniya Azadiya Kurdistan in, li Laçinê hene û roj bi roj xurttir dibin. Li aliye din, li hemû deverên Sovyetê ku Kurd tê de dijîn komel û asosiyasyon (yekbûn) hene ji bo tev bi hev ve bêngirêdan, ber bi itifaqê ve dimeşin. Girêdana van komelan giş bi Eniya Azadiye re heye. Ev komel li Corciya, Li Kazakistan pirr bi hêz in.

Hêvî û xebatên me li ser bingeha damezrandina welatekî serbixwe ye. Welatê me bê hejmar şehîd dane, divê xwîna şehîdan li haşê neçe û pêneye leyîstin. Em li hêviya wê rojê ne. Sedamê xwînxwar û yên wek wî li dagheha Kurdan bêne mehkeme kirin.

Hûn bi ci çavî li tevgeren neteweyî û sosyalist dinêrin?

-Li gor dîtina min tu dewletteke sosyalist tune; giş ji bo mafêni xwe yên nasional in û zehfîn wan ji berjewendiyen xwe yên kesane (şexsî) diparêzin.

Mesela, em dibêjin Apê Ho. Wî ci kiriye ji bo me?

An ji Kuba, lîderê Kuba ji bo me ci kiriye?

Apê Ho, tenê ji bo miletê xwe kar kiriye. Fidel Castro ji. Sosyalizm li hemû deran li ser rûpelan maye. Ger serokên şoreşen hemû dewletê sosyalist baş bûna, dê behsa mafêni gelên din ji bikirana. Lî em dinêrin, wan ji xwe û miletê xwe pêştir behsa tiştekî din nekirine û pêkneanîne.

Hûn bi ci çavî li tevgera Berzanî û Telabanî dinêrin?

-Li gor dîtina min, ew eşîr in, li pey berjewendiyê xwe yên kesane ne. Girêdanê (têkiliyîn) wan bi dewletê dijmin û xayîn re zêde çedibin. Em Kurdên Sovyeta berê ji baş dibînin ku ji PKK ê pêştir tu rêxistin xwe bi gelê Kurd nedane qebûl kirin. Bi xurtbûna hêza Partiya Karkerê Kurdistan, rûçikêñ rêxistinê eşîr û girêdanê wan ên bi dijmin re derdi Kevin ber çavan û gelê Kurd ji êdî rêxistinê baş û feodal ji hev vediqetîne û ber bi partiya xwe ve diçê, tê de cihê xwe digre, ji bo serxwebûn û azadiya xwe.

Helbesteke Vanîkê Elîxan

BER XERÎTA KURDISTANÊ

Bi guman û bi dilê kul, Ber xerîta Kurdistanê sekînîme,

Dinivejim ser nivîsa te, Kurdistanâ min a bindest

Dilêm derd û kul e tijî, Ji bo pêşmergeyê kuştî, Ji bo mal-hal, gund-bajaran, Şewitandî, wêrankirî.

Lê gumana min ser wê ye, Ku zû-dereng tê aza bî, Ji zincirê ceng û qetla, Bindestbûna hezar salî ye.

Ü tê rast kî pişta xwe zû, Ji giraniya barê quiltyê, Dawaşînî derd û kul e, Bindestbûn û perçebûn e.

Ez guman im ew roj ê bê, Kurd ê bibin xwey war-dewlet,

Ku wek roja cejna Newroz, Roke din ji bêjin pîroz.

Heppeyvîn:

R. Baxdû - M. Günbat

Zimanê Agir

Pirtûka Süleyman Danışman ya helbestan, bi navê zimanê Agir (Ateşin Dili) di nav weşanên Melsa de derket. Ev pirtûka wî ya yekemin e. Pirtûk bi zimanê tîrkî hâtîye nivîsandin.

Helbestvan Süleyman Danışman de sala 1948 an de li bajare Elezîzê, li gundê "Çakan" hâtîye dinê. Ji sala 1971'ê û pê de li curbecur bajaran mamostetiya wêneyan dike. Helbestvan, ji xeynî xebata helbestan, xebata wêneyanîye ji dike. Heta iro, 3 heb serbixwe û 3 heb ji kollektif tevî hev di 6 pêşangeh de (sergi) wêneyen xwe pêşangeh kiriye. Weke gelek ronakbireni Kurd, Süleyman Danışman ji, zilm û kotekiye dewletê kişândiye. U gelek işkence û zordarî di girtigeha Amedê de para wî ketiye.

Helbestan ku di vê pirtûkê de ne, di navbera sala 1978 û 1990 an de hatine nivîsandin. Helbestvan di helbestan xwe de, geh dike kûrahiya dîroka gelê Kurd û geh ji ji kûrahiya dîrokê tê rewşa Kurdistan iro. Qala zilm û zordarya dijmin û li hemberê zilmê ji berxwadana Kurdan dike.

Di naverokên helbestan Süleyman Danışman de babeten ku pêşî bala me dikşîne û helbestvan li ser disekine ji ev in: Eşen gel, evîna civakî, berxwedanen gel û yên li zindanan bûne, hezkirina niştiman, hêvî, zilm û zordarya dijmin û serfirazî ...

Bi rastî di nav helbestan de em şewaneyen (Dize) pirr delal dibînin. Di nav şewaneyen de ji taswîren rind hene. Lî ev şewaneyen delal di nav zehfîn


helbestan de bi hev re baş nehatîne girêdan.

Bi vî awayî ji herikandina (Akicilik) şewaneyan winda bûne. Hin kîmasiyê din ji, hindik bûna hevdenga (uyak) û navhevdenga ye (îç uyak) ji ber vê ji û şewaneyâ aheng tune.

Weke ku tê zanîn di helbestan de ji xeynî delaliya şewaneyan û taswîren gerek e aheng hevdeng û navhevdeng ji hebin. Çavên xwendevanan di helbestan de li wan ji digere.

Yekî din ji, di helbestan helbestvan de şewaneyen giran hene. Bi tevâhi helbestan wî ji ewqas ne sivik in. Di helbestan de şewaneyen delal û yên di bin tesîra popûlîzmê de, bi hev re dicin.

Lê mirov gava bi çavekî giştî li




Süleyman Danışman

pirtûka Süleyman Danışman binêre, di derheqê helbestan wî de kare bikeve baweriyeke baş, lê helbestvan ger hinekî din zimanê xwe sivik bike, bi rengekî herikî (akici) şewaneyen xwe girêbide û ji bin tesîra popûlîzmê derkeve.

Her tiş li aliyeke, em di xebata helbestan de serfirazî ji Süleyman Danışman re dixwazin û ji xwendevanen helbestan re ji vê pirtûkê pêşniyar dikin.

Murat Ergin



Berga (Qapaxa) Zimanê Agir

Xelîl Xeyalî

● Di dîroka Kurdistanê de sê kesên girîng hene ku bi xebatê xwe yên li ser zimanê kurdî têr naskirin. Herwiha van kesan di warê neteweperestiya kurdî de jî pêşengiyê dîrokî kirine. Yek ji wan Ehmedê Xanî ye ku navê xwe bi tipêr zêrîn nivîsandiye, yê duyemîn, Xelîl Xeyalî ye ku şopa E. Xanî domandiye û bi xebatê xwe yên zanistî û rêxistinî, rê û metoda ilmî nîşanî gelê xwe daye. Yê sêyemîn, Celadet Bedirxan e ku ew jî damezrenêrê (hîndarê) alfaba kurdî ya latînî ye. Ev her sê nav, ev her sê çîra roniya Kurd û Kurdistanê ne. Gelê Kurd bi wan serbilind û ji wan re deyndar e.

Felat Dilges

(2)

Gelek mixabin xebatê Xelîl Xeyalî yên li ser rêziman û ferhenga kurdî negîhîstîn destê me. Musa Anter di "Bîranînê xwe" de dibêje "Xelîl Xeyalî beriya mirina xwe notêr xebatê xwe da min. Di nav wan de wesîqayen gelek giranbuha hebûn. Destnîvisa Dîwana Hecî Qadîre Qoyî, Gramera Kurdî ya ku Ziya Gökalp bi destê xwe nivîsibû lêkolinê wî yên li ser ziman hebûn. Li gor agahdariyê ku M. Anter dide, gava ku ew di 1972 an de tê girtin, hêzên dewletê dest didin ser pirtûkxana wî û piştî ku ew berdin, ew doza van pirtûkan bike jî, jê re dibêjin me ew şewitandine (4).

Herwekî ku em ji çavkaniyê dîrokî hîn dibin, Xelîl Xeyalî navkî bi Ziya Gökalp re li ser ferheng û rêzimana kurdî xebitiye. Zinar Silopî di Doza Kurdistan de wiha dînivîse: "Xelîl Xeyalî ku bi zimanê erebî û fransî baş dizanibû; bindestî û xizaniya gelê Kurd didit; bi pêwistiya ji derdê gelê xwe re çare dîtinê, gramer û ferhenga kurdî nivîsibû. Ji destpêka sed-sala nozdan de li İstenbolê dima, di nav xortêr Kurd de ji bo his-yarkirin û pêşvebirina hesta neteweyî dixebeitî. Di encama rastlîhatineki de wê gavê bi Ziya Efendiyê kurê Tevfik Efendi -ji zazayêr navça Çermükê, li Diyarbekir rûdînişte hevdû nas kîribûn. Ziye di Mektebi Tibbiyê de dixwend û ji ber ramanê xwe yên azad ji dibistanê hatibû avêtin -Ziya Efendî kengê ku bû Tirk! nas-navê Ziye Gökalp stand û di nav damezrenêrê "Türk Ocağı" û "Türk Yurdu" de cih stand. Xelîl Xeyalî û Ziye Efendî dest bi nivîsına gramerâ û Ferhenga kurdî kîribûn ku Ziye Efendî ji dibistanê hat avêtin û wî ev berheman bi xwe re bir Diyarbekir. Ji wê demê bi sun de têkiliya Xelîl Xeyalî û Ziye Efendî bi hev re qetiyabû û heya îlankirina Meşrûtiyetê hevdû nedîtbûn. Piştî meşrûtiyetê, li ser civîna Qongra Komela İttîhat û Terakkî li Selanîkê, Ziye Efendî bi delegetiya Diyarbekir dema ku li İstenbolê ye, Xelîl Xeyalî van xebatê ku bi hevdû re amade kîribûn jê dixwaze, lê Ziye Efendî naxwaze bide; dibêje: "min ew şewitandin." Li ser ve yekê Xelîl Xeyalî ji nû ve dest bi nivîsına van xebatê ku mîletê Kurd hewcedarî wan bû, ki-

ribû (5).

CEND GOTIN DI DERMAFÊ ZİYA GÖKALP DE

Ziya Gökalp di sala 1876 an de li Çermükê (Amed) hat dinê. Bavê wî Mehmet Tevfik karmendekî (memûrekî) dewleta Osmanî bû.

Di jiyan Ziye de sê merheleyen girîng hene. Merhela yekemîn bi welatparêzîn Kurd re di têkiliye de ye û di vê demê de bi Xelîl Xeyalî re li ser zimanê kurdî dixebsite. Merhela duyemîn merheleyekî bê istîkrar e ku di vê demê de bi wasita rojnameya "Peyman" ê fîkrîn Osmanîti û ummetiyê diparêze. Di merhela sêyemîn de ramanwêrekî İttîhat û Terakkî ye; pêşkêsiya fîkrîn nîjadperest dike û ramana "Welatê Tûrân" davêye holê. M. Kemal di bin bandûra fîkrîn wî de ye û rûmetekî mezîn dide Ziye. Bîguman êdi Ziye dev ji kurdîtiya xwe berdaye.

Ziya Gökalp di pirtûka xwe ya bi navê "Türkçülüğün Esasları (Bingehîn Tîrkîtiyê)" de wiha dibêje: "Mirovekî dema ku bixwaze nikare neteweya xwe biguherîne; ew ne di destê wî de ye... Lî çawa ku mirov besdari partîyekî dibe, bi tenê bi vîna (îrada) xwe mirov nikare besdari vî an wî mîletî bibe." (6)

Ziya Gökalp xwedî şexsiyetekî nexwes (meraz) e. Demekî xwestiye xwe bikuje; demançe berî serê xwe daye lê ne mirîye. Bi rastî ji wekî ku ew dibêje dirûvî partî guhertînê û neteweya xwe guhertînê bi hev nakeve. Wî Kurdîtiya xwe red kiriye; lê ne bi vîna xwe. Berjewendiyen şexsi hiş û mîjî pê re nehiştibû.

Pirtûkî Ziya Gökalp bi navê "Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler (Di Dermafî Eşîrîn Kurdan de Lîkolinê Sosyolojik)" heye ku ev pirtûk bi handana (Teşwîqa) Wezîrîn Tendûristî (sağlık Bakanı) Dr. Rıza Nur hatîye nivîsandin. Rıza Nur wiha dibêje: "Min bi Ziye Gökalp li ser Kurdan lêkolin da kîrin. Armanc ew bû; piştî ku ez di derheqê wan de bûm xwedî agahdariyê ilmî û aborî min dê sazgehekî avabikira da ku tirkbûna Kurdan bidim fîmkirin. Ev mirovên ku iro ji wan re "Kurd" têr gotin, ez ji zû de dizanîm ku ew Tirk in (7)." Bingehî Tirkbûna Kurdan (?) bi vê berhemâ Ziye Gökalp tê avêtin. Divê mirov bi navê pirtûkî nexape. Lewra pirtûk ji serî heya dawîye bi mebesta ku

Dr. Rıza Nur tîne ziman hatîye nivîsîn û tê de gelek eşîran Kurd, Türk hatîne nîşandan. Ev pirtûk ji alî heyeta wezîran (Bakanlar Kurulu) ve pîrî tê ecibîn û Atatürk teqdîr dike. 300 lî-re pere didin Ziye Gökalp (8).

Bîbextiya ku Ziye Gökalp bi gelê Kurd re, nemaze (axlem) bi Xelîl Xeyalî re kir ne hindik e û ji bîr nabe. Gelo Ziye çîma wiha kir? Li gor dîtina min Ziye dît ku "roj ji Kurdan re baş nagere" û pêşengîn gelê Kurd di avakirina dewleta Kurd de (wê demê) bi ser nakevin. Heke baweriya wî pê hebûya ku dê Kurd bi ser bikevin dibû ku iro ew neteweperestekî Kurd bîhatâ naskirin.

Ziya Gökalp ji dîtin û ramanê Xelîl Xeyalî geleb istîfa-de kir. Nemaze di mijara ziman de ramanê wî, ji nû ve şrove kir û li gora berjewendiyen Tirkan bîkaranî. Welatparêziya Xelîl Xeyalî bû bingeha ramanê Ziye Gökalp ên nîjadperest. Nîjadperestî Ziye Gökalp ji bû agir û bi serê Kurdan de ri-jîya.

Di dîroka Kurdistanê de sê kesên girîng hene ku bi xebatê xwe yên li ser zimanê kurdî têr naskirin. Herwiha van kesan di warê neteweperestiya kurdî de jî pêşengiyê dîrokî kirine. Yek ji vana Ehmedê Xanî ye ku navê xwe bi tipêr zêrîn nivîsandiye, yê duyemîn, Xelîl Xeyalî ye ku şopa E. Xanî domandiye û bi xebatê xwe yên zanistî û rêxistinî, rê û metoda ilmî nîşanî gelê xwe daye. Yê sêyemîn, Celadet Bedirxan e ku ew jî damezrenêrê (hîndarê) alfaba kurdî ya latînî ye. Ev her sê nav, ev her sê çîra roniya Kurd û Kurdistanê ne. Gelê Kurd bi wan serbilind û ji wan re deyndar e. Nivîskarê Doza Kurdistan Zinar Silopî,

Xelîl Xeyalî û Ehmedê Xanî bi vî awîyî rûbirû dike: "Di pey E. Xanî de ku di tevê dinê de hem-dengê wî kêm in... ew nivîskarê ku bi zaravê kurmancî dînivîsîn, ji tevan bêtir Xelîl Xeyalî, mirovekî bi rûmet bû ku neteweperestiya kurdî, di belavkirina hîs û ramana kurdî de di-xebitî" (9).

Xuya ye Zinar Silopî navê Xelîl Xeyalî di pey navê filozofî nemir E. Xanî de bi bîr tîne. Bîguman ev rûmeta ku dîrokzan û nivîskarê Kurd didin Xelîl Xeyalî û bi rîzdarî navê wî bi bîr tînin, welatparêzê hêja heq kîribû. Li gor agahdariyê ku Malmisanij di pirtûka xwe (Seîdî Nursî û Pirsa Kurdî) de dide, Xelîl Xeyalî di kovarîn "Roja Kurd", "Netewa Kurd",

PÊNÜS

Amed Tigris



Festîwalê Almanya hejand

Dî roja yekê Tebaxê de, ji her welatî û ji pirraniya bajarê Ewrûpa Rojava Kurd di rê de bûn. Ew bi trê, otobus û otomobilan ber bi bajarê Almanya Bochumê ve rê dikudandin. Otobus û otomobilan wan bi alayê PKK, ERNK û rengê kurdî hatibûn xemilandin. Hema hema her kesî jî, ji rengê kesk, sor û zer tiştek li xwe kîribû an jî bi xwe vekiribû. Saet li derdora 11'an serê karwanê Ewrûpayê gehîste bajarê Bochum. Bochum reng guhart. Her derê wê bû kesk, sor û zer. Bochum ji roja ku bûbû Bochum ne ewqas mirov dîtibû, ne ewqas Kurd dîtibû û ne jî rengê kesk, sor û zer.... Dîtin û komkîna 50-60 hezar Kurd ên kesk, sor û zer ne karê her kes û karê her bajarî ye! Rojek be ji Bochum bû Kurd. Ne tenê Bochum gelê kesen din ên ne Kurd jî ku hatibûn festivala Bochumê ew jî bûbû Kurd. Jî wan kesan yek jî Yalçın Küçük bû, di festîwalê de bi kurdî qise kir û wiha got:

"Gelê Kurd, êdî ne geleki bindest e. Gelekî berxwedayî û serfiraz e. Ji iro pê ve ez jî Kurd im. Ji bo têkoşîn û serketina gelê Kurd ez bi can û ruhê xwe amade me. Ez spas ji gelê Kurd re dikim, ku wî lawekî wek birayê min Apo derxiste holê! Iro navvendiya şoreşa cîhanê Kurdistan e. Kurd ne bi tenê xwe, dê herwiha hemû bindesten cîhanê jî rizgar bikin. Silav ji gelê Kurd re! Silav ji birayê min Apo re..."

Jî warê organize, birêvebin û programkirinê ve êdî mirov bi çavekî vekirî û zelal didit, ku PKK-ERNK hatîne sewiya damezrandina dewletê. 2500 kes tenê di organize, parastin û kar û barê xizmetê de, cih girtin. Ev bûyereke gelek mezin e. Alman matmayî man û hisen wan bi vî tişti nedîghîst. Demek trafika bajê rawesta. Bi destpêkirina festîwalê balonên kesk, sor û zer li ser bajarê Bochumê bi hewa ketin. Ferqa festîwala Navnetewiya Kurdistanê ya li Bochumê û ya Olîmpiyadan nema bû. Bochum bûbû Olîmpiyada Kurdan... Bi 250 kesî folklor, bi 300 kesî jîmnastîk û bi 200 kesî koro derketina sahaya futbolê..

Ji aliye din ve gelê Kurd êdî bi hemû imkanen xwe ve amade ye, ku bîkeve xizmeta şoreşe. Zanabûn fedakarî paralel dimeşin. Bi reng û dengen xwe ve Kurdan stadyuma Bochumê xemilandin û lerizandin. Deng û rengê Kurdan bi tenê di nav stadyumê de nema, çend saet paşê reng û dengê Kurdan li her derê Ewrûpa belav bû.

Belê, encamên xebata navnetewî wilo girîng e. Divê û pêwist (hewce) e, ku mirov vê deng û rengê navnetewî, ji bo rojîn pêş hîn jî bilind, gurr geş û berfireh bike

"Yekbûn" û "Jîn" û de nasnav (bernav) ên Kurdiyê Bîtlîsi, Modanî X, M.X, X û bavê Neco bîkaraniye (10).

Xelîl Xeyalî di 1946 (Naci Kutlay dibêje) an de, gava ku mirîye di dora heşte salî de bûye (15).

Çavkanî:

- 1) Zinar Silopî, Doza Kurdistan, r:30
- 2) Malmisanij, Saîd-i Nûrsî ve Kurt Sorunu, r:104
- 3) Malmisanij, bhd (berhemâku navê wê derbas bû) r:105
- 4) Musa Anter, Hatiratum, r:67
- 5) Zinar Silopî, bhd, r:29-30
- 6) Ziya Gökalp, Türkçülüğün Esasları, r: 21
- 7) Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler, r: 6, Pêşgotina Şevket Beysanoğlu
- 8) Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri, r: 8
- 9) Zinar Silopî, bhd, r: 31
- 10) Malmisanij, bhd, r:111
- 11) Zinar Silopî, bhd, r:29
- 12) Zinar Silopî, bhd, 30
- 13) Zinar Silopî, bhd, r:34
- 14) İsmail Göldâş, Kürdistan Teali Cemiyeti, r:27
- 15) Malmisanij, bhd, r: 111

Girîna Cizîrî

Xemê Zaxoyî

Keçeye Kurd e, iro li welatê xerîbiyê dijî. Kurdiya wê xweş û nerm e. Ew jîr û jehatî ye û ji dengê wê yê rast û dewlemend dixuye. Stiranê wê tekûz in, çi ji aliyê hozan (şîfr), awaz û dengî ve. Di gel vê yekê ji tijî bi pesnê xweş û dirist... Rûda, bûyer û tiştî ku li welêt yan li xerîbiyê çêbûne, wê li stiranê xwe gotine. Anku ew bersiva dema xwe dide. Lewra wek rewşenbîreke welatparêz tête hejmartin.

Pişkeka (qisim) biçûk ji berhema (intac) wê ketiye destê me. Ew ji li bandê hunermend Beşîr Botanî hene. Weke stirana Bilbilo, Newroz e û hwd...

Dengbêjeke din ji heye, navê wê Nêrgiz e. Wê ji stiranek ji stiranê Girîna Cizîrî gotiye. Navê stiranê ji "Her bijî". Bi rastî stiraneke xweş û cos e.

Min hunermend Girîna Cizîrî li Newroza Malmö-Swêd di 21.3.1992 an de dît. Ew di gel koma mameste Beşîr Botanî bû. Bi rastî Girînê bi dengê xwe yê xweş, rast û dewlemend şeva Newrozê geş û coştir kir...

AWAZÊN WÊ


Awazên Girîna Cizîrî resen (esil) in. Bingehêwan Botanî ne... Weke tête zanîn dengê wê dewlemend e, êdî li awazên wê ji dewlemendî diyar dibe. Stirana Newrozê ya ku wê li Newroza Malmeyê gotiye û Beşîr Botanî li bandê tomar kiriye (dagirtiye), bi xwe ji pênc awazên rengîn hatiye çêkirin. Di gel vê helbest ji gelek dewlemend e... Dengê vê keça hêja gelekî dewlemend e û ji dengê M. A. Cizîrî û H. Cizîrî dewlemendit e. Lî cihê mixabinê ye ku Girînê heya iro ji ci stiranek li kasêtê ne gotiye. Lî belê rondik ji çavêne me barîn dema ku Beşîr Botanî û Girîna Cizîrî li Radyowa Dengê Serxwebûnê stirana "Mala min Kurdistan" li rîkefta 20.12.1991 gotin.

Bi rastî karekî gelekî hêja ye heger em hunera hunermenda jehatî Girîna Cizîrî kom bikin, biparêzin û vejînin. Û hemû ji bo pêşxistina hunera kurdi.

Li dawiyê, em hêvîdar in ku hunermenda me Girîna Cizîrî li ser soza xwe be ku berdewam bibe li vê karê hunerî. Em pê serbilind in ku ew bûye alikara hozanê me Beşîr Botanî û bingehêk ji bingehêwî ji bo vejandina hunera gelî. Édî pêşketin û serketina vê hunermenda ciwan û nûgiha, daxwa za me ye!

Bilbilo, meqam Seba

Bilbilo her bixwîne
Birînê me gemrîne



Hunermenda Girîna Cizîrî

Ji bo Mezlûm, Kemal û Xeyrî
Ew rîberên serxwebûnê
Of, bilezîne

Bilbilo her bixwîne
Birînê me gemrîne
Kurdistan tim dinalit lo
Derd û kul û birîn e

Egîd rabû Newroz hat
Tola me stand roj helat
Kurdistan tim dinalit lo
Jêra em dikîn xebat

Bi xebata Bêrîvan
Her der bû ewr û baran
Kurdistan tim dinalit lo
Yan serxwebûn yan neman

Bi hewara heval Baran
Coş bû şâhya serhildan
Kurdistan tim dinalit lo
Didinê xwîn û canan

Berxwedana me ges e
Strana wê pîrr xweş e
Kurdistan tim dinalit lo
Malwîran ïn ci rewş e

Pahîza 1990

Newroz e, Meqam Ecem

(A) Silav û pîrozbahî Newroz e

Li her cihekî şahî Newroz e
Zaro li meydanê hey
Dikine dilanê hey
Hêy hêy hêy Newroz e
iro Newroz e, Newroz e,
Newroz e
Sersala me ye li me pîroz e

Va ye roj li me helat Newroz e
Xweşa mezin bo me hat
Newroz e

Çirok û stiran e hey
Dengê bilbilan e hey
Hêy hêy hêy Newroz e
iro Newroz e, Newroz e

Wênesaz: Delal Botanî

Newroz e
Sersala me ye li me pîroz e

(B) Egîd ji bo dozê ye Newroz e
Ronahya Newroz e ye Newroz e
Şehîdê gelê me hey
Egîdê gelê me hey

Hêy hêy hêy Newroz e
iro Newroz e, Newroz e,
Newroz e

Sersala me ye li me pîroz e

Jîna me herdem xweş bê
Newroz e
Agirê me her ges bê Newroz e
Mezlûm û Zekiya hey

Rêha me hemîni hey
Hêy hêy hêy Newroz e
iro Newroz e, Newroz e,
Newroz e

Sersala me ye li me pîroz e

Newroza 1992

Her bijî, meqam Ecem

Her bijî cenga gelî
Pêşkevin partizan

De hildin ala rengîn
Li asmanê Kurdistan

Her bijî, her bijî, serhildana me
bijî
Her bijî, her bijî, berxwedana
me bijî

Va gel rabûye ser xwe
Daweta me li Botan
Navenda xebatê ye
Ew himbêza berxwedan
Her bijî, her bijî...

Gelê me pîrr hişyar e
Tev dibêjin em Kurd in
Serhildan û berxwedan
Diji sitemen dijimin
Her bijî, her bijî...

Newroza 1992

Abdurahman Durre



Azadî bê xwîn nayê standin

"Ku xwîn nerije azadî nayê standin." Ev gotin a yekî korê Azerî ye, ku roja sisîyê Gulanê bi balafira Demirel hatibû Tirkîyê. Di balafirê de li ser pirsa rojnamevanan wiha digot: "Sala par, di şerê nav Ermenî û Azerîyan de, çavên min kor bûn, ez xem nakim, lewra ji bo azadî û serxwebûnê divê mirov kor be û bimre."

Bi rastî ji wilo ye, buhayê azadî û serxwebûnê, xwîn û mirin e.

Gelek heta nehêje, bighêje serxwebûnê
Heta ku lê nerêje, barût û lav û xwînê

Dinya hemû bibêje, dijmin dibe li şûnê
Dema ku xwîn birêje, dê seh bikin ci deng e

Dengê piling û şêra, dêwê çiya û lata
Mêrxas û jîr û mîra, şoreşgerê welata

Dengê kewê şikêra, fîzar û kîferata
Halân bidin ku pêra, dê seh bikin ci deng e

Azadiya belek çav, bûka qelen ku xwîn e
Dilşadiya şîrîn nav, lê pîr şehîd ku çûne

Dê û keç û kur û bav, lê can ku dan li dû ne
Dûman û pêt û alav, dê seh bikin ci deng e
Şairê hêja Dildar ji di helbesteke xwe de, li ser azadiyê, bi zarava soranî wiha gotiye:

Milletî, ger xûnî nerjî, dest û pa nagritewe
Bê kifah guftar, wesiqey jînyê nadritewe
Bade û mestî meqamê, Hurrîyet nagritewe

Yanê, miletek heta ku xwîn nerjîne, payîdar nabe, bê şoreş û têkoşîn ji, gotin bi tenê, belge û wesîqa jiyanê nadîre, bade, mey û mestî ji, cihê hurriyet û azadiyê nagire.

Azadî serfirazî, bûka qelen ku xwîn e
Bê wî ku nabe razî, lê pîr şehîd ku çûne

Li ser hurriyet û azadiyê mirov ci bêje kêm e. Bi hezaran helbest û diwan binivise, bi sedan cild kitêb û pirtük çêke, hê ji qedr, rûmet, şîrîn û giranbuhayiya wî nikare pêkbîne. Lewra ku ew, cewherék wala ye, durreyek bê buha ye, namûs û rûmet e, şeref û qîmet e.

Azadî çiqas bi qîmet û rûmet e, li dij û dijminen wî ji ewqas bê heysiyet û bê rûmet in. Ew kesen ku ji xwe û ji gelê xwe re, azadî û serfirazî bixwaze, divê ji hemû gelên azadîxwaz re ji bixwaze, ku nexwaze bê şeref û bê perwaz e.

Li ser wî awayî, divê ku mirov bi însaf û bi wîjdan bisikine û bifikire, bêşeref û bênamûs, hîlebaz û teqlebaz nebe.

Hezretî Muhammed di hediseke xwe de wiha gotiye: "Kî ku ji xwe re ci dixwaze, wî tiştî ji hevalê xwe re ji nexwaze, ew bê iman e, ne musliman e."

Ez ji muslimanê Tirk, Ereb û Ecem vê pîrsê dikim Gelo, ev muslimanê bimbarek, çawa ku ji xwe re, azadî û serxwebûnê dixwazin, wisa ji gelê Kurd re ji dixwazin, an na? Eger ku naxwazin, çawa diben "em musliman in", golo fêm nakin, an kûciktiyan dikin?

Ji caşikên bê namûs re ji dibêjim, ku hûn bi qurbana rêxa binê lingê wî Azerîyê kor bibin, qet pozê we ji wî dişewite an na? Gelo di dinyayê de, ji navê caşiktiyê pîstir û çepeltir navek din ji heye ku mirov li we ke an na? Tifû li wî rûyê we yê bê şerm û bê namûs.

Şairekî Kurd, di derheqê caşikê Iraqê yê namîdar "Şêx Reşîdê Lolî" de wiha gotiye:

Eger gûyê diya xwe, yan jinekey bixwara
Şâş nedkîrî riya xwe, nedîçû li dû neyara
Nizanim golo em ji caşikên xwe re ci bêjîn?

Elo û şetan

Mirovek hebû digotinê qas dikolan her rehêne ge-Elo. Ew dostê şetanan nim derdiketin. Şetanan bû. Carekê wî gote wan.

-Werin em bi hev re genim biçinin!

-Baş e! Haydê em biçin.

Wan genim çandin û dema genim geha û çebû. Elo gote şetanan.

-Gelî şetanan! We serê genim yan binê genim divê?

-Me binê genim divê. Elo genimê xwe yê taze dirû û bire aşê. Şetanan erdê kolan. Ci-

nikarî fêla xwe li me bikî.

Piştî ku pîvaz geha û çebû Elo ji şetanan pirsî.

-Gelî şetanan! We belgên (pelên) pîvazan yan binê wan divê?

Şetan: Me pelên pîvazan divê.

Şetanan belgên pîvazan hemû dirûn û Elo ji binê pîvazan hemû anîne der û ji xwe re imbar kir. Lê belgên şetanan hemû ri-zîn û Elo careke din fêla xwe li şetanan kir...

-Kes nikare bi min! Ez ji şetanan şêtantir im! Ha ha...

-Mala te wêran be Elo!
-Ha ha ha ha....

Xwelî bi serê me! Elo em xapandin û fêleka wi-sa li me kir ku hêj kesî ew fêl (hîle) li me ne ki-riye.

Piştî demekê Elo gote şetanan.

-Werin em bi hev re pîvazan biçinin.

Şetan: Va em hatin, va em hatin.

Wan pîvaz çandin... Şetan:Elo vê carê tu



Kêvroşka jîr û seyê har

Kêvroşkeke jîr û xapînok hebû. Wê hez ji gêzer dikir. Carekê, ew çû nav bexçeyê. Gelek gêzer li wê hebû got.

Oy Gêzer! Gêzer ha ha ha ha!!!

Wê têr xwar û çû mala xwe... Dotira rojê Kêvroş dîsa çû wê bexçê, seyek hat û wî jî dixwest kêvroşkê bixwe.

Se: Wiw wiw! Wiw wiw! Ez dê te bix-wim! Wiwww! Hatme te!

Wiw wiw! Seyê har ne hişt ku kêvroşk gêzeran bixwe û her roj berdida wê û ne dihêla ku kêvroşk nêzîkî bexçeyê bibe...

Se: Wiw wiw... Rojekê kêvroşkê gote xwe:

-Divê ez fêlekê (hîlekê) bikim! Ez dê seyê har bixa-pînim... Ha ha ha ha...

Paşê kêvroşkê gote kitkê (pisikê).

-Kitkê! Cihek heye geleksîk lê hene!

-Mêw mêw!!! Gelek spas! Mêwww! Ez birçî me! Mêw! Kêvroşkê mala te ava!

-Spas xweş! De xwe bî-lezîne.

-Mêwww baş e! Ez dê bêm!


Kêvroşkê kitik bire rex seyê har û se jî berda kitkê...

Se: Wiw wiw! Kitkê ez dê te bixwim...

Kitik: Mêw mêw...

Kêvroşk: Ha ha ha ha...

Kêvroşka jîr û çeleng her roj bi vî rengî, gêzer di gel awazên "Wiw wiw û mêw mêw" dixwarin...



Qefezi zêrîn

Sefa kiçêkî biçkolaneye... tî xiwahafizî le Sefa bikat, belam Sefa Xêra gitî û birdiyewe bo mal û xistiye qefezezîkî zêrînewe û pêy wit:

Leber ewey xoşim ewêy, leber ewe îtir na-yelim bigerêtyewe... Her xiwardin û awêkit pêwîst bû min detdemê jiyanit pirr le şadî dekem...

Colekeke be kuli giryane we witî:

Min pêwîstim bem xo-

şewîstî û serey to niye

ke le serbestî bê beşim deka...

Sefa hîç giwêy be qisey colekeke neda, paş çend rojêk hestî bewe kird ke colekeke zor mate û naxwêne û lawazîş bû... Lîy pirsî: Ewe çite xo nesax nî?

Colekeke witî: Berê Wella nexoşim!

Sefa witî: Ha ber êsta

bo lay pizîşkit debem...

Colekeke witî: Min dezanim ew dermane ciye ke tîn û şadî beleşim debexşêtew...

Sefa witî: Başa nawî dermane ciye? De bîlê ba guric biçim botî bikrim...

Colekeke witî: Dergay qefezeke bikere we ca ewsa nawakeyit pê elêm.


Sefa dergay qefezekey kirdewe... Colekeke qefezekey becêhêt û witî: Teniya serbestî tîn û şadîm pê debexşêtew...

Sefa temâsay colekekey kird be şadîyewe defrê ewsa têgeyiş eger yekê colekey xoş biwê nabê le qefezda bendî kat...

Cîrokî minalan be zrawey Soranî

Serçawe: Pertûkî "Minal û Baran", Letîf Helmet kirdüyetî be Kurdî Wergerandin ji tîpêner ebî:

Mehabad Kurdi.



15'ê Tebaxê roja ji dayîkbûna..

Destpêk rûpel 1

û qedera mirovê Kurd ji destêne wî hatibû derxistin.

Xweinkarkirin û dijayediyen zanava xwe kirin, mirovê Kurd rapêcabû û Kurdbûn ketibû seriya mirinê.

Çerx û aşê asimîlasyonê we latparêzî û insambûna mirovîn me dihêrt û dewleta Tirk em kiribûn qeraş û aşvanê vê hêtinê.

Ji perçiqandina raperîna Dêrsimê heta bi 15'ê Tebaxê sala 1984 an 45 sal derbas dîbin. Bi dirêjahiya 45 salan in sanen me hatin mengene kirin, hêtin û hûr kirin. Di ewqas salde em ji xwe û kesaniya xwe, ji esil û reha pîr dûr ketibûn, em ji xwe bêhtir tiştekî din, kesen din bûn. Netıştekbûyîn û bi kîrî tiştekî nehatin bûbû nav û paşnavê me.

Dewletê kevirên xwe sax lem danibûn, bi xwe zêde bawer bû. Şarezayê perçiqandin û belavkirina raperînen Kurdistanê bû. Nemaze dewletê piştî 12'ê Îlonê xwe pîr bi hêz dikir.

Dewletê hêzen li dijî xwe, partî û sendikayê karkerî belav kiribûn, avêtibûn binê zîndanan, terk û dinya kiribûn û diqêriya: "Ez her tiş im, ez ci bixwazim wek min dibe."

Berê ji Kurdan serî rakiribû. Belê emrê van, serîrakirinê berê ne dirêj bû. Dewletê Osmanî û yên Tirk ev serhildan û raperîn bê dijwariyên mezin hilweşandibûn.

Di raperîn û rabûnên berê de tim zora Kurdan diçû û Kurd

Mîrhem

her tim dişkestin.

Psîkoloji û şexsiyeta şikestinan zerardar û nexweşîhilgir e, bawerîşikêne.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Xwediyê psîkolojiye wiha jî dest û lingên wî têne girêdan. Deriyê felat û ronahiyê lê têne girtin, lal û gêj dibe.

Piştî şoreşa Dêrsimê li Bakurê Kurdistanê rewşa me rewşa mirovê şikestî û malkambax bû.

Dewletê em zeft kiribûn, em kiribûn kole û ji kolan jî, kole 15'ê Tebaxê û rahiştina çek ji bo me bû, deriyekî nû, bû riya xelasiyê û çirûsk û pencera hêviyê.

Ev hêvi iro piştî 8 salan mezin bûye, bûye malê mîlyonan, ketiye her derê, gihîştiye gundû bajaran, bûye serhildan û bûye yekîtî û tifaq.

15'ê Tebaxê em ji qiraxa newala mirinê vege randin. Dara me sîn kir û stewri û nêzîkbûyîna me bi terr vekir. Bi vê rojê re, gelê me ji nû ve ji diya xwe bû.

Em êdi ne kurdünde ne. Ocax û warê me sîn e û xetera mirinê ji bo me nemaye. Pişta me ketiye koletiyê, berê me ketiye azadî û serxwebûnê. Dara me geş dibe û em bûne artêş, cebhe û partî. Em bûne ARGK, ERNK û PKK?

Mîrhem

her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Her şikestinê sawa dewletê, xof û tîrsa hêzen dagîrker di xiste dilê xelkê û mîna pençen şer mejiyê xelkê diguvaşt. Psîkolojiya tîrsê, şikestin û binke tina mîrxasiyê diçilkîne, dadi werivîne. Têhn û dilopên terayaya mîraniyê dijuje.

Bi kuştinan em zêde dîbin

Destpêk rûpel 1

Piştî birîndarbûna Burhan Karadeniz berpîrsiyarên Özgür Gündemê bîryar dan ku ji niha pê ve her meh qesleyek rojnamevanen xwe yên metropolê biseyne Kurdistanê. Qesleye pêşîn roja ïnê ji İstenbolê çûn Amedê. Di vê ekibê de ev rojnamevanen hene: Şirîkê rojnameya Özgür Gündem Av. Y. Serhat Bucak, Rêvebireki karê nivîsan Taner Kutlay, Mudurê pêwendiyen bi gel re Ramazan Ülek, ji navenda nûçeyan Sena Oguzertem û du nûçegihan Selami İnce, Rıza Zingal.

Ev kuştin û hovîtiyan kontreyan li Batmanê roj bi roj zêdetir dîbin, ji ber ku heta niha welatparêzên Batmanê wek Nisêbînê, Cizîrê, Hezexê û wek Farqînê helwesten xwe yên rast dernexistin holê. Divê ku xelkê Batmanê bi lez milîşen xwe derxin, da ku rê li wan kontrayan bigrin û van kuştinê welatparêzan bisekinin. Dîtin û ramanen ronakbîren Batmanê ji ev e... Welatparêzên Batmanê heta ku li hember van êrisen kontrayan xwe bidin paş û bitirsin dê ev hovîti û kuştin ji, ji alî kontra ve dom bike. Ji xwe dewleta mîtinger û hêzen tarî ji vê dixwazin. Dixwazin ku gel bitirse û bi vê tîrsê ji doza xwe dûr bîkeve. Ev listikek e li ser gelê me dileyizin. Divê gelê me vê listikê vala derxe.

İro gelê Kurd tev zanin ku li

pişt van êris û hovîtiyan dewle ta dagîrker û mîtinger TC heye. Ji ber vê yekê leşker û polîşen dewletê çavê xwe li van kuştinan û hovîtiyan dîgrin. Ji aliye k din ve jî alîkariya xwe bi her awahî bi wan re dikin. Ev kuştinê wan rojnamevanen vê baş tîne ber çavan. Di vê hefteya buhûrî da nameyek e, polîşekî TC di rojnameya Özgür Gündemê de hate weşandin. Ew polîş di nameya xwe de dibêje: "Em bi her awahî alîkariya xwe bi van kontrayan û hizbiyan re dikin. Em çekên wan nabînin. Em wan tevî çekan ji bigrin, dewlet wan serbest dihêle û di derheqê wan de tu pîrs venake.

Ji ber vê yekê em dizanin ku dewlet li van kontrayan dibe xwedî. Ji aliye k din ve jî, gelê bê çek û bê xwedî li holê dihêle da ku ji alî van kontrayan ve bêtin tîrsandin û ji tîkoşîna rizgariya neteweyî dûr bikevin. Ev listika dewleta dagîrker e.

Tê zanîn ku dewlet ev listik li Nisêbînê li Hezexê, li Kiziltepe û li Amedê derxistin holê. Lî belê xelkê van deveran bi pirranî bi vê listikê hisiyan û ji nav xwe milîş derxistin û rî li kontrayan girtin. Ji ber ku xelkê Batmanê milîşen xwe dernexistin, hizb-i kontra û hêzen dewletê yên tarî ji xwe re cihekî girîng li Batmanê girtin. Ji ber vê yekê ji roj bi roj kuştinê wan hovtir û zêdetir dîbin.

Ambargo ya PKK'ê...

Destpêk rûpel 1

Seçil Kazaz di daxuyaniya xwe ya BBC de dîtinê xwe wiha anîn ziman: "Ambargo ya PKK danî ji, ya Sedam û ji ya Neteweyen Yekbûyî zehftir bi tesrî bû. Me bawer ne dikir ku PKK dikare tiştekî wiha pêk bîne. Ger ev ambar go wişa dom bike wê gelê me bîkeve rewseke pîr dijwar. Ji bo rakirina vê ambargo ye me ji Tirkîyê daxwaz kir ku li ser navê me ji Neteweyen Yekbûyi alîkari bixwaze."

Ev du hefte ye ku PKK nahêle tu qemyon di sînor re derbasî alîyê Kurdistana Başûr bibin. Ji berî ambargo ye, û vir ve yek qemyonek ji sînor derbas nebûye

Berpîrsiyarên deriyê gumrikan dibêjin." Ji bo derbasbûna qemyonan ci ji destê me tê em alîkari bi xwediyê qemyonan re dikin lê dîsa ji kes naxwaze derbas bîbe."

Weke ku tê zanîn, PKK berî demekê, li gundûn derdora sînor belavok belavkiribûn. Di van belavokan de behsa xayîntiya ku serokên PDK û YNK ê, Berzanî û Telabanî bi gel re dikin, dikir. Di belavok de hatibû nîvîsin ku ev serok weke her car iro ji li dijî gelê xwe bi dewletê impêrialist re tekiliyê qirejî daşînîn û ji bo çend quruş pere dikevin rewşa cehşîtiyê û hatibû gotin ku enama tîkîliyê wan ê tarî her dem birakuji û talankirîna welat e.

Mebûsên HEP'ê gera..

Destpêk rûpel 1

Di dawîya vê gera heyeta HEP û de wê raporekî bê nîvîsandin û ew rapor li hemer partîyen siyasi, komarîn demokratîk, rojnameyan û li dinê bê belavkirin. Ji aliye k din ve jî HEP paketeke nû demokratîk dê çêpîke û vê paketî li parlamento Tirkîyê bîne ziman. Di dawîya gera heyeta HEP û de mebûsê Wan'ê Remzi Kartal ji dîtin û ramanen xwe li ser helwesten dewletê û yên gelê Kurd wiha şrove kir.

"Roj tune ku însanen me nayen kuştin. Ev bi dîtinê me perçeyek ji şerî psîkolojik e. Dewlet li Bakurê Kurdistan ketiye astengiyeke mezin. Ji ber vê yekê êrisê xwe li hember gelê

Kurd roj bi roj zêdetir dike. Da wîyê tê xuya kirin ku TC dixwaze ji xwe re riyajenosidî veke. Lî belê gelê Kurd bi helwesta xwe ev rî lê girtiye. Ev tev takîkên dewletê dagîrker û mîtinger in. Cerdevan hizb-i kontra, tûmîn taybetî, rîveberiya tayefî tev perçeyen şerî psîkolojik û şerî germ in. Ew ji hevdî naqetin. Lî gelê Kurd edî şiyar e, li mafîn xwe yên mirovatiyê û li welatê xwe xwedî derdikeye. Ev helwesta gelê Kurd heta bi vî renjî bidome, rizgarbûn evqas nîzîktir dibe. TC her çiqas ji in kar bike iro li Kurdistanê şerî germ heye û ev şer xwe li her deverî di jiyana gelê Kurd de diyar dike."

Zîndan û edalet..

Destpêk rûpel 1

Îro, di girtigeh û zîndan de 2 hezar û 230 girtiyen fîkrî hene. Li gor Wezîr Edalete ev girtî tewanbarê terorê ne. Bes bi gelek mînakîn dikare bê ispat kirin ku zehfîn van girtiyen ji ber dîtinê xwe yên politîk di hundir de tê girtin. Di nav van girtiyen de piir kes hene ku ji ber nîvîs û pîrtkîn xwe hatine cezakirin. Ji xwe daweyen ku di derheqî Ismail Beşîrî û Rojnameyîn siyasi de tê vekirin ji di de ispat kirin ku li Tirkîyê mirov ji ber nîrîn û fîkrîn xwe tê cezakirin.

Weke ku tê zanîn sala çûyi, efîyek hat îlankirin, bi vê efîyê, ji xeynî endam û alîgirîn PKK'ê gelêk girtî ji hundir derketin. Lî di pey vê efîyâ şeklî re, li gor qanûna hejmara 3713, ya têkoşna li hember terorê hate afirandin û bi navê vê qanûna dîsa girtigehan tîji kirin. Ev girtiyen nû ji, zehfîn wan alîgir û sempatîzanen PKK'ê ne. Ev ji baş dide xuya kirin ku bêdafe (bêdafe) û newekhevî ne tenê li derive, lê di hundir de ji didome.

Nîha di zîndanê Tirkîyê de 2 hezar û 230 tewanbarê fîkrî radîzen. Pirranya van girtiyen endam û sempatîzanen PKK'ê ne. Ji van girtiyen 378 di girtigehan tayefî de ne, ji ber ku ew "tewanbarê terorê" ne.

Ji 378 girtiyen 368 heb xwedî dîtinê çep in. Tewanbarê fîkrî bi giranî di zîndanê Kurdistanê de ne. Hejmara van girtiyen li zîndana Amedê 672, li zîndana Elezîze 130, li ya Meletê ji 259 e. Li bajaren Tirkîyê ji girtiyen herî zehf li İstenbolê di girtigeha Sağmacilar de ne. Hejmara wan 345 e.

Ji xeynî van girtiyen, bi hezaran mirovîn Kurd di qereqol û nezaretînan de ne. Her meh qesleyek ji wan berdin, qesleyeke din dîxin nezaretînan û zîlm û işkence li wan dikin.

Ew rewşa zîndan û nezaretînan de ne. Ev tenê aliye k nedemokratîbûnîn dewleta Tirk e. Bes ev rewşa zîndan tenê, bes e ku mirov dewleta Tirk bi faşîzmî tewanbar bike.

Bi rastî di dewleteke wek Tirkîyê de mirov gelek caran ji xwe dipirse gelo ci karê "Wezaretî Edalete" di dewleteke bêdalet de heye?

Dewlet kuştîyên..

Destpêk rûpel 1

Ji ber vê ji alîkariya aborî ya bi malbatan re barê dewletê giran dike. Weqfa leşkeran bi xwe ji bo her leşkerekî ku tê kuştin 7 milyon û nîv pere dide malbatan wan. Ica yên serbaz û serdaran hê zêdetir in. Ji xeynî alîkariya peran, berpîrsiyariya xwendîn û perwerdekarîya zaroğan wan ji dewlet bi xwe dike.

Ew 3500 leşkeren ku li gor daxuyaniya dewletê di perwerde û ta lima leşkerekî di mirine dibe sedemî gelek pîrsan di mejîyê mirov de. Ev hejmara 12 car li zaiyatîn sere Qibrîs û 5 car ji li yên şerî Kore ne.

Bê guman di nav van 3500 leşkeren ku dibêjin zaiyatîn talîma leşkerekî ne, zafî wan di şerî bi gerîla re de hatine kuştin. Lî dewlet ji bo di nav gel û leşkeran de tîs çenebe û psîk

Cejna yekîti û serbilindiya gelê Kurd

Festîwala navneteweyî

● Stadyûma Boxûmê (cihê leyîstika gokê) ji bo 55 hezar kesan hatiye ava kirin. Dema ku festîwal dest pê kir û pişt re bi saetekê, di stadyûmê de cihê rûniştinê nema, lê hîn bi dehan otobus û bi sedan teqsî di rê de bûn û bi hezaran kes li derve bûn. Dema ku ew kesen derengmayî jî gîhiştin stadyûmê, rê ne li hundir û ne li derive nema, êdî gelek kes li derive man û stadyûm têra gelê Kurd nekir. Gelek kesan digot, "Girîng e carek din stadyûmeke cihê sed hezar kesî bê girtin, enî roj bi roj fireh dibe, êdî em di salonan û stadyûmê 50-60 hezar cîhan de hilnayê.

Zêdeyî şest hezar (60.000) mirovê Kurd û bi sedan kesen dosten gelê Kurd yên ji gelek derdorê cihanê, di cejna pirozkirina hilpişkîna panzdehê Tebaxê de, li bajare Bochum (Boxum) e hatin cem hev û di bin alên PKK, ERNK û ARGKê de, yekîtiya gelên cihanê nîşanî dost û dijmnan kirin...

GÎHÎSTINA FESTIWALÊ

Di dîroka Kurdan de ev cara yekemîne ku Kurdêñ ji welatê xwe û rastiya xwe dûr ketî, bi deh hezaran têñ cem hev û ji bo tayîn-kirina qedera xwe bi awazên bilind û enîvekirf diqfrin. Wek ku tê zanîn, li Ewrûpa zêdeyî mîlyonê mirovê Kurd dijîn. Hin ji ber zilma dijmin hatine û hin bi sedemîn din hatine. Lê sedem çibe, sedema tewra mezin bindesbtûna welatê me û zilm û zordesiya neyarêne me ye, ku mirovê Kurd terki welat bûne.

Lê bi kar û xebata Eniya Rizgariya Netewa Kurdistan (ERNK) ev mirovê wiha hişyar bûn, vegeryan ser rastiya xwe û li ser doza welatê xwe bûn yek.

ALA RENGİN Lİ SEMAYÊN EWRÜPA

Bi destpêkirina festîwalê, komek zarok derketin ser çîmenen kesk û nepoxên kesk û sor û zer bi sedan, berdan jor û ala rengin li semayen Ewrûpa bilind bû. Dema ku rengin neteweyî bilind bûn jor, ji kîfan re gel rabû ser piyan û bi çepik û İflandinan stadyûm hejandin. Piştre bernameya festîwalê bi rawestina li hîzûra şehîdan dest pê kir. Zêdeyî şest hezar kesan ji her perçeyê Kurdistanê û ji gelek derdorê cihanê mirov tev rabûn ser piyan.

Piştre ku bername bi zimanê kurdi, tirkî û elemânî hate pêşkêş kirin, bi serkîsiya şefî orkestra yê İqbâl Hicabi Koma Berxwedan û Orkestraya Kurdi derket.

Piştre orkestrayê xorten Kurdistanê bi cîlén spore derketin ser çîmenen kesk û bi cawen kesk û sor û zer yên di desten wan de, xerîteya Kurdistanê çê kirin û navê parti, Enî, Artêş û Serok nîvisandin. Piştre hereketen sportif kirin û diawiyê de hemû rez bûn û portreyen şehîden şoreşa Kurdistanê tev rakirin ser serê xwe û li hawîrdora çîmenen gokê, bi meşek nerme (hêdî) û bi müzik torenî meşyan. Dema ku wiha meşyan gel li hîzûra şehîdan, hîsîren çavêñ xwe negirtin û piir dilgerm (duygusal) bûn, bi dirûşmeyen "şehîd namirin" tev bi

hev re bang kirin.

Piştre vê, komek müzikê ji Kurdistana Başûrê mezin derket û bi soranî helbest gotin. Piştre berpirsiyarek ERNK axavtineke bi kurdi, li ser 15'ê Tebaxê kir. Di vê axavtine û, li ser rewşa gelê Kurd ya kevin û ya pişt 15'ê Tebaxê rawestiya û girîngbûna festîwala navneteweyî anî ser ziman û li ser leyîstokên neyaran û nokeran axivî û qala yekîti û piştgiriya gelan kir.

Piştre koma folklorê ya BASK (bindestê İspanya) derket û ji çanda gelê xwe berhemên folklori pêşkêş kirin. Pey re berpirsiyarek

gelê xwe pêşkêş kirin.

Li pey vê müzikê wekilek gel ji parlamento ya İspanya axavtina kir û di axavtina xwe de got: "Bi dîti na yekîtiya gelê Kurd li vir ez gelekî kîfxweş bûm û ez baş dizanîm ku ev yekîti, ev kîfxweş bi PKK ava bû, ji ber vê yekê ez dibêjim; Bişî PKK."

Dema ku wiha got gel tev li çepika xist û bi dirûşmeyen "Bişî Apo" bersiv dan. Di pey re hozana Bilgesu Erenus derket û bi zimanê kurdi, tirkî, filistînî, kubayî helbest gotin û got: "Ez jinek Türk im, lê dilê min ji bo gelê Kurd lê dixe."

derket û çend helbesten şoreşgerî pêşkêş kir. Di müzikâ xwe de yekîtiya doza gelê Kurd anîn ser ziman û gel jî bi çepik û İflandinan bersiva vê daxwaza wan da.

Dire nîvîskar Ayşe Zarakolu derket û li ser rewşa welêt û tirkî axivî.

PİŞTGİRİYA NAVNETEWEYÎ

Piştre, mesajen ku ji festîwalê re rîkiribûn hatin pêşkêş kirin. Ji bo festîwalê ji van cihan mesaj habîbûn:

Biryargeha Navnedî ya ARGKê, Biryargeha Herêma

Ocalan, serokê PKK û ERNK hate xwendin. Di mesajê de li ser rewşa Kurdistanê û ya dijmin ya fro li ser wezîfeyen gel û bilindkirina şerî rizgariya neteweyî radiwestî. Dema ku mesaja Serok hate xwendin, gel tev li ser lingan li çepikan xist û bi dirûşmeyen "Bijî Serok Apo, Bi xwîn bi can em bi te re ne ey serok" stadyûm hejand.

Piştre Nasir Rezazî çend helbest pêşkêş kirin.

Dire komên folklorê yên ji gelek derdorê Kurdistanê, nêzîki sed xort û qızan derketin ser çîmenan û reqisîn, dema ku ew li ber def û zîrnî reqisîn gel tev rabûn ser piyan û bi destê hevdû girtin û tev li dîlanê bûn. Dengê İflandinan di ezmanan re derdiket û gel tev kîfxweş û dîşad bû.

Piştre Komek müzikê ya Alman derket. Marşek bi kurdi lêxistin û marşa Internasyonal xwendin.

Festîwala neteweyî saet li yekê nîvî destpê kir û li dehê sevê bi helbesta "Apo hate Hilwanê" dawî bû.

Li ser pêkanîna vê sevê em bi navê rojnameya Welat bi gelek kesan re hevpayîn çêkir.

Ji Hollanda, İswiçre, Fransa û gelek derdorê Ewrûpa û ji Tirkîyê Kurdistanê gelek kes habîbûn, me ji wan pirs kir ku ji bo sazkirina vê sevê ci dibêjin:

-Festîwal gîhişt armancâ xwe, em roj bi roj xurt dibin. Ev nîşana pêşveçûna kar û xebata gelê me ye. Fro em bi dîtina vê gelek kîfxweş bû...

-Ev festîwal ji bo 15'ê Tebaxê, serşala ARGKê ye. Serhîdanek mezin e. Bi dîtina me, dê ji fro pê de ferîlayen ARGK gavén mestîrîn biavêjin û xurttir bibin.

-Em Kurd in. Em dixwazin hikûmeta kurdi ava bikin. Festîwal vê nîşan dide. Ma ne bes e.

-Festîwal piir xweş e, piir mezin e, piirbi kîfxweş derbas dibe.

-Em ji piirbûna gelê li vir kombûfî fêm dikin ku pêşîya me piir ronahî ye û parastî ye (güvençeli ve aydinlik), min li vir baş fêm kir ku di demek hîn nîziktir de wê têkoşîna me bi ser ke ve.

-(Pirekeki Kurd) Ez ji Frankfurte têm, ji bo welatê xwe em amade ne ku her tişî bikin. Ez ji kîfa re hew dikarim biaxivim...

-Ez ji Parisê têm, fro em fêm dikin ku di dîroka Kurdistanê de festîwalek wilo tu caran çenebûye. Ev ji vê dide xuyanî kirin, ku ev berhemâ têkoşîna gerîla ye.



60 hezar mirov beşdarî festîwalê bûn.

ERNK li, ser festîwalê û 15'ê Tebaxê axavtina siyasi ya bi zimanê tirkî kir. Ev axavtina bi riya teknikî di cih de tercumeyi elmanî bû, ku dosten xerîb fêhm bikin.

Piştre komek müzikê ya dimîlî derket û çend helbesten şoreşgerî bi dimîlî pêşkêş kirin. Piştre vê, Mebusê Mûsê, ji Partiya Keda Gel Sırri Sakîk derket û silavên ji Kurdistanê anîbûn, silavên germ li gel kirin. Wê demê gel tev bi İflandinan li çepika xistin û qiyemetdayna welet bi dirûşmeyen, "Kurdistan vatanımız, onun uğrunda ölürtüt" nîşan dan.

Piştre ozan Beşîr Botanî çend helbest pêşkêş kirin. Dû re, komek müzikê ya ji Qibrise haff derket û bi reşek folklori müzikâ

Piştre koma müzikê ya Koma Şîrvân derket. Endamên Koma Şîrvân ji seryek çîmenen gokê hefta sahneye meşyan û şareta zaferî li gel kirin. Ji ber ku bêhna welat ji wan dihat.

Piştre Doç. Dr. Yalçın Küçük derket û li ser serbilindiya Kurdi ya bi rîberiya PKK û axivî. Piştre orkestraya kurdi û Koma Berxwedan derket û çend helbesten şoreşgerî pêşkêş kirin. Piştre orkestraya Kurdi, berpirsiyarek rojnameya Özgür Gündem Yaşar Kaya derket û li ser politikaya dijmin, li ser qirikirinê hîzî kontra û kuştina rojnamevan rawestiya û dîlxwesiye xwe ya serkevtina gelê Kurd anî ser ziman.

Piştre komek müzikê ya Filistin

Serhîde ya ARGKê, Heyeta Sazûmankariya Enstituya Kurdi, İsmail Beşîkçi, Musa Anter, Yekîtiya Rewşenbîrîn Welatparêzîn Kurdistan Xebatkarêن Özgür Halk yê Agirî, TKP-KIVILCIM, Yekîtiya Dîndarîn Kurdistanê, Dilxwazîn ERNK yê Alman, komek şoreşgerîn demokrat yê dilxwazîn ERNK ji Danîmarka, Komünîst DEVRİM yê li Ewrûpa, Alîkarên TKEP yê li Almanya, Yekîtiya Jinê Welatparêzîn Kurdistan, Dostek gelê Kurd Harold Pinter, temsîlkariya Toplumsal Kurtuluş ya li Ewrûpa, Yekîtiya Keda Gel ya Fransa, Rojnameya Yeni Ülke ...

Li dawiyê mesaja Abdullah

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır

• Berpirsiyarek Gişî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarek Nîvîskar (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat

• Navîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D: 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60 - 511 66 02

• Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya a Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715

• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ



BİCAN BI XWİN EM BİTERENE EY SEROK

Stad, bi sloganen şoreşgerî hejîya

welat